

## Kawayê hemdem Mazlum Doğan 'BERXWEDAN JİYAN E'

Çend navên bi navê Newrozê re hatine girêdan û bûne yek hene.

Navên Kawayê Hesinker, Mazlum Doğan û Zekiye Alkan li serê van navên wilo tên.

Bi taybetî navê Newrozê û Mazlum Doğan bûne du perçeyên dilekî û bi hev re rastiyeke timam û bi mane dikin.

Rûpel 15



# Agirê Newrozê geş bikin

● Gelê Kurd, 2600 sal berê, di bin rêberiya Kawayê Hesinker de, li hemberî Dehakê zordest ji bo azadiya xwe dakete şer. Niha jî gelê me, li dijî Dehakên nuh di bin pêşengiya Kawayên xwe yên hemdem û lenheg ji bo serxwebûn û azadiyê di nav şer de ye

● Gelê Kurd, bêtirî 2600 sal in ku cejna Newrozê pîroz dike. Lê divê ku mirov, rastiyeke din jî bibîne. Newroz, bi Kawayê hemdem Mazlum Doğan gihîştîye wateyeke nûjen. Naveroka Newrozê jî dewlementir bûye

Newroz, roja nuh ya, serkevîna ronahî û azadiyê ye, li hemberî tarîfî û koledariyê.

Newroz, cejna gelê Kurd ya neteweyî ye. Du aliyên Newrozê henin. Yek ji wan dîrokî, mîtolojîkî û neteweyî, yeka din jî berxwedan, serhildan, azadî û serkevîna e.

Gelê Kurd, bêtirî 2600 sal in ku cejna Newrozê pîroz di-

ke. Lê divê ku mirov, rastiyeke din jî bibîne. Newroz, bi Kawayê hemdem Mazlum Doğan gihîştîye wateyeke nûjen. Naveroka Newrozê jî dewlementir bûye.

Gelê Kurd, 2600 sal berê di bin rêberiya Kawayê Hesinker de, li hemberî Dehakê zordest ji bo azadiya xwe da-

Rûpel 15



Newroz bi serhildanan tê pîroz kirin...

### □ Ji kulîsên meclisê

Zübeyir Aydar Rûpel 3

### □ Weqfa Vehbi Koç

Musa Anter Rûpel 9

### □ Newroz û pêşeroj

Gürdal Aksoy Rûpel 10

### □ Kurdayetiya ronakbîrên me qels e

Mehmet Uzun Rûpel 12

### □ Newroz: Roja xwenuhkirinê

Mehmet Aktaş

Rûpel 16

## Piraniya meclisê zordarî xwest

Roja 17 ê vê mehê Meclîsa Enqera Rêveberiya Taybetî (Olağanüstü Hal) minaqeşe kir û xiste dengdanê.

Li Meclîsê 380 kes amade bûn. 321 kesî jî bo dirêjkirinê, 58 kesan li dijê dirêjkirinê dengên xwe dan û şexsek jî bê deng ma.

Axaftina ewil serokwezîr Süleyman Demirel kir:

"Merc û şertên em mecbûrê

Rêveberiya Taybetî kirine hê dom dikin... 9 salan Gerîna Awarte û 5 salan jî Rêveberiya Taybetî li vê herêmê hatiye meşandin. Ev di zik hev de dibin 14 sal. Zarokê 7 salî îro bûye 21 salî û di emrê xwe de hê rejîmekî normal nasnekiriye. Me çu fêde jî jê nedît. Îro li hundir 3000 û li derve jî 7000 li ser

Rûpel 15

## Qontr-gerilla êrişî xelkê dike

● Heta niha li Nisêbinê qontr-gerilla welatparêz bi dizî dikuştin. Îro bi ser malan de digrin û avahiya bi panzeran xeradikin. Hikûmet li vê zilmê temaşe dike lê gel bêdeng namîne

Ev nêzikî sê meh in hêzên dewletê li Nisêbinê welatparêzên Kurd dikuje. Heta berî çendeyek însanên me bi şev û bi dizî dihatin kuştin, lê îro êdî nema bi dizî, tîmên taybetî di nivê rojê de êrişê ser malên gel dikin, avahiya bi panzeran xeradikin, heta zarokên di pêçekan de didine ber berekan û qetil dikin.

Roja 17 ê meha Adarê tîmên taybetî bi ser mala Yusuf Dündar de digirin, li ser dîwarê hewşa xênîyê wî rismê kuçikekî çêdikin û wiha dinivîsin "Emê koka malbata we biqelînin, her mirovekî ku di nava gel de were hezkirin û bi welatparêziya xwe bête naskirin wê bîn kuştin."

Rûpel 15

## Li Mazra, Çewlik û Dêrsimê Gundan bombe dikin

● Ji 9 ê Adarê û vir de sêkuçka nav bajarên Mazra (Elazığ), Çewlik (Bingöl) û Dêrsimê çend caran hatiye bombebaran kirin

Ji serê sala nuh û pêde demê heta niha çend caran hêzên dewletê bi hinceta perçiqandina PKK û qempên gerila herêm û deverên welêt bombebaran dikin.

Pêla bombebaran û êrişên azmanî çend caran jî sînor derbes kirine û Kurdên başûr êşandine.

Li gora xeberên ku dîgêjin Rojnameya Welat ku ev xeber hinekî jî bi nerastî û

nîvqurmiçandî di rûpelên rojnameyên Tirkiyê de jî tene dîtin, vê hefta dawî bêj hema ji dora 9 ê Adarê û vir de sêkuçka nav bajarên Mazra (Elazığ), Çewlik (Bingöl) û Dêrsimê çend caran hatiye bombebaran kirin.

Roja 10 ê mehê çiyayê Beyhan (Akdağ) û heta 13 ê mehê jî sê rojan li sêkuçka nav hersê bajarên bi sedan bombe hatine barandin.

Rûpel 15

## ROJEVA WELÊT

### Em Newrozê çawa pîroz bikin?

Rojên neteweyî û nas hene. Newroz rojê wilo ye, xwedî cih û navdar e. Çiroka Newrozê pir kevin e, li dora 3000 sal heye. Zilim di şexsiyeta Dehak de serhildan jî di ya Kawa de, di vê roja Newrozê de tene hember hev û heqî neheqiyê zorbirî dike.

Rûpel 15



# REWŞ

Abdullah Keskin



## Em û xwendevan

Ji wexta ku hejmara me ye yekemîn derketiye, ji welêt, derveyî welêt û bajarê Tirkîyê gelek telefon û name (mektub) hatin. Em; dîtin û daxwazên xwendevanan tînin ber çavan û li ser wan disekinin. Di her hejmarê de hinek ji wan nameyan çapdibin.

Bi alîkarî û pîrozîyên xwendevanan em dilxweş dibin. Ev alîkarî me dişidînin û rojnâmê xwirtir dikin.

Daxwazîyên xwendevanan gelek in û texlît-texlît in. Ji sedî 90 xwendevan ji zimanê rojnâmê memnûn xwiya dikin. Ev tiştekî girîng e. Piştî 70 salî, hetta 700 salî (xwendin û nivîsandina bi kurdî bi sedsalan li nav gel belav nebûye) bi tîpên latînî û bi kurdî weşan derdikevin û gel van weşanan fam dike. Ev rewş, hêviyên mezin ji mirov re çêdike. Civaka Kurdan, civakeke kevneşop e. Ev 70 sal in çar dewletên mêtînger dixwazin vê civakê asîmîle bikin, lê civaka me dînamîkên xwe reng û şaxên xwe yên

neteweyî wînda nekirine.

Li aliyê din rastiyeke heye. Çiqas kêmbin ji xwendevan x, q, w, î dipirsin. Qedexkirina zimên di civaka me de birînen pir xedar vekirine. Bi baweriya me kêmasiya mezin ne bi tenê ya ziman e. Kurdî têra xwe dewlemend e, qaîde û rêzimana (gramera) zimanê kurdî heye. Pirsgirêka mezin xwendin û nivîsandin e, hînbuna zimên e. Bi xebate-

### Pirsgirêka mezin xwendin û nivîsandin e, hînbuna zimên e. Bi xebateke ilmî û ciddî pirsên zimên wê di demeke kurt de halbibin

ke ilmî û ciddî pirsên zimên wê di demeke kurt de halbibin. Hînbûna zimanê kurdî weke **Amed Tigrîs** jî di nivîsareke xwe de gotî, pênc deqîqa digire. Di vî rûpelî de (2) ji hejmara pêşî de em li ser hînbûna xwendin û nivîsandina kurdî disekinin. Ev nivîsar wê demeke dirêj dom bikin. Pirs û zehmetiyên xweyî di vî babetî de ji me re bişînin. Bersiv û metoda xwendin û nivîsandinê hûnê di vê stunê de bibînin.

Dosyayên me ji nivîsaran hatine dagirtin.

Di demeke nêzîk de em dixwazin cih bidine nivîsarên **soranî** jî. Demeke din em dixwazin xweber û gotarên **dîmilîkî** zêde bikin. Zarave (lehçe) ne kêmasî, dewlemendiya zimanekî tê hesibandin. Di van rojên pêşiya me de hûnê nivîsarên soranî di rûpelê **Welat** de karibin bixwînin.

Ji bo rûpelê zarokan her roj ji me re çîrok û gotar tînin. Ji ber ku gelek in û çapkirina hemûyan ne mimkun e, em dixwazin van çîrokan bikin kitêb (pirtûk) û derxin. Navên deveran jî bi kurdî tînin. Van navan jî hem emê di rûpelê rojnâmê de derxin û hem jî bikin kitêb. Em ji her xwendevanên xwe dixwazin ku navên deverên lê dijîn, bajar û gundan tev de ji me re bişînin.

Xwendin û nivîsandina kurdî gelekî bi rûmet e û girîng e. Xwendevanên me ji sedî 90 name û xeberên xwe bi kurdî dişînin. Êdî bes e. Em dixwazin tev de bi kurdî bin.

Parastina zimên weke parastina welêt e. Ziman bi xwendin û nivîsandinê tê parastin. **Nureddîn Zaza** dibêje: **"Kurdino! Heger hûn dixwazin wînda nebin, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin, li zimanê xwe xwedî derkevin."** Xwendin û axaftina bi kurdî mafekî mirovî ye. Heta niha gelê me ji vî mafî mehrûm bû. Îro serbest e. Vêce dora peşvebirina çand û zimanê kurdî ye.

## Xwendin

Ziman rastî û dewlemendiyeke sêalî ye: Li aliyekî axaftin, li yekî xwendin û li yekî jî nivîsandin heye.

Zimanek hêz û qeweta xwe ji van rastiyan digre û gava aliyek ji van aliyên kêmbin be, rawestiya be yan jî wezîfa xwe neke, ziman jar û belengaz dikeve. Axaftin, xwendin û nivîsandin heryekê stûneke zimên in û hersê bi hev re zimên ava dikin.

Avahiya zimên li ser rîknên axaftinê, nivîsandin û xwendinê bejin dide, balix dibe û distewe.

Zimanekî xwirt û tekûz bê axaftin, bê xwendin û bê nivîsandin nayê pê.

Hejmara xwendevanan, baş û xerabiya xwendina xwendevanan, kî çawa dixwîne, ji xwendina xwe çiqasî fêhm dike û bi kurdî pratîk û adeta xwendina zimanê zikmakî çendî kevin e, rûniştîye û ji xelkê re bûye mal hwd. girêdayê rewşa zimên bi giştî û serbestiya zimên bi taybetî ye.

Heger em ji awira van hersê stûnên ku avahîlîgîrên avahiya zimên in rewşa zimanê kurdî di ber çavan re derbas bikin, rastî ne dilxweşkir e, belê dilgûvêş e.

Çend kesên me, ji sedî û ji hezarî çendên me li bakurê welêt dikarin bi kurdî biaxivin, bixwînin û binivîsin?

Em nivîsandinê li aliyekî bihêlin, ji sedî çend kesên me dikarin bi kurdî bixwînin û tiştê ku dixwînin fêhm bikin?

Miletê me demeke dirêj li bakurê welat bi zimanê xwe ne xwend û ne nivîsî.

Zimanê me bi tenê mabû zimanê axaftinê. Axaftin jî di nav sîmorekî zehf teng de bû.

Xwendin û nivîsandin rawestiyabûn, sekinîbûn.

Vê rewşê kurdîya axaftinê jî çilmisand, xezna peyvîkên xelkê me teng û xezan kir. Nav me û xwendina bi kurdî vebû. Em man li aliyekî û xwendin ma li aliyê din.

Xwendin û xwendevanên zimanê kurdî divê li hev nêzîk bibin divê bi hev şêrîn bibin.

Rojnameya **Welat** vê dixwaze, ji bo vê daxwazê derdikeve.

Xwendina kurdî xweş e, xweşî sebrê divê. Bê sebr û xwewestandin ev xweşî bi destên me nakeve.

Dijwariyên alfebeyî, zehmetiyên alfebê biçûk in, di çavên xwe de mezin nekin. Ferqa nav alfebeya me û ya tirkî çend tîp in. Ew jî tîpên X, Q, W, Ê (x, q, w, ê) ne. (î) û (i) yên me jî hemberê (ı) û (i) yên tirkî ne. Ji bo (ü) û (u) yên tirkî jî em (u) û (ü) bi kar tînin. Naskirina van tîpan karê çend deqîqan e.

Em bîr ser zimanê **Welat**, ev dikare bê gotin: Zimanê welat ne giran e, bivê nevé di welat de hin peyvê "nuh" "nuhbîhîstî" hene, pêde dibin, wê pêde bibin. Ev jî ji bo pêşketina zimanê me lazim in.

Çare, xwendin e, xwendin û sebr e. Bixwînin, ne carekê, belê çend caran bixwînin. Bila çavên me peyvîk, rêzik û nivîsandina bi kurdî baş nas bikin. Wî çaxî hûn ê bibînin ku zimanê welat sade, zelal û ne giran e.

## NAMEYÊN XWENDEVANAN

### Tu bi xêr hatî Welat

Derketina te dilê welatparezan gelek xweş kir. Belê rûyê çavnebar û neyaran jî reş kir.

Digotin qey wê gelê Kurd û pêşverûyên gelê Tirkî timî rojnâmeyên Babialî bixwînin û ji wan bawer bikin. Belê dema pênûs kete destê we, ew gelek bizdîyan û çar alî êrişê ser weşanan niştîmanî kirin.

Dema nivîskar û muxabirên rojnâmeyên Babialî tînin kuştin yan dimrin, weşanên Babialî roj bi roj rdeng û behsê wan dikin û li ser heyf û mixabineta wan dikevin şîrê. Belê behsa kuştina muxabirên Y. Ülke û 2000'e Doğru nayê kirin. Ev rewşa hanê durîtiya wan baş dide nişan. Gelê me baş dizane kû rojnâmeyên Babialî hevalê MIT'êne. Ma weşanên pêşverû çima derketin? Piştî derketina weşanên niştîmanî tîrs kete dilê wan. Pê hesiyên kû derewên wan êdî naçin serî.

Dixwazin welatparêzin me bi destê qontr-gerilla bi navê dîndarî û Hizbullah bidin kuştin. Heya duh jî navê Hizbullah di nav we-

latê me de tune bû. Dibe hinek dîndarên me bêne xapandin. Belê ya rastî eve kû dixwazin gelê me berdî hev. Îro em hemî dizanin gelek nimejker û rojîgirên me jî li nav têkoşîna gelê me de ne.

Nexwe ev leyzokî tînin danin ji bona tirsandin û qirkirina gelê me, bi destê me bi xwe. Cendîrme şandin ne bû, muxbir û axa şandin ne bû Mîlîs şandin dîsa nekarîn me berdine hev. Gotin gelê Kurd dîndar e, em bizû vî awayî wan berdî hev.

Ger ne bihistîbin bila bibihîzin. Hûn çî bikin êdî wekî we çênabî. Gelê me hişyar e. Ne xulamokên axaya ne. Dizanin kû hebûna wan bi jîneke bi şeref e. Bi kuştina nivîskarên me em dawî nadin. Me hezar nivîskar hene. Emê her roj zilma zalima bêjin. Em mecalê nadin tîrsê. Bila bizanin kû gelê me bi van leyzokan nayên xapandin. Wê gelê me bikare dijî van leyzokên qirej û çepel jî şer bike û ser bikeve.

Li ser navê hinek welatparez û azadixazan Çolemêrgê.

### Cejna Newroz pîroz be

Derketina "Welat", di meha Adarê de bi cejna Newroz re li me hemûya pîroz be.

Em zarokên gelê bindest, bi cejna xwe ya Newrozê piştigirîya tevgerên rizgariya hemû gelên bindest, yên ku li dijî emperyalîzmê û faşîzmê ne, dikin. Her wiha piştigirîya têkoşîna rizgarîxwazî û piştigirîya rojnâmeya "Welat" dikin.

Divên gelek silavên şoreşî

-Li sazûmankarên welat

- Li Kawayê Hesinker
- Li Kawayê hemdem Mazlum Doğan
- Li aleva Newrozê Zekiye Alkan
- Li hemû şchidên gelê me
- Li hemû gelên bindest
- Li hemû karker û azadixwaz
- Li hemû gelê me
- Li welatê me

Cejna Newroz pîroz be

Avle, Rinde û Baran/Izmir

### Welat ji bo me mizgînî ye

Gelî endamên hêja, rojnâmevanên hêja, nivîskarên hêja û xebatkarên hêja yên Rojnâmeya **Welat** ê.

Damezirandina rojnâmeya kurdî ya nû herwiha "Welat" mizgînî e ji bo me. Em gelekî kêfxweş kirine. Herwiha, em bi dil û can ve jiyânî, pêşveçûnî, xebata neteweyî ya hêja ji we re diyar dikin û bi tim alîkariyê em amade ne ji we re.

Em newroza we bi dil û can ve pîroz dikin.

Ji bo xebateke hêja e neteweyî, kar û barê serfirazî û serkeftinê ji we re dixwazim û ji Rojnâmeya "Welat" re pîrozbahî û silavên xwe yên şorişgerî pêşkêş dikim.

**Berpîrsiyar û sipîkera dengê Radyoya Kurdistan Êncamê Genêvê Rohnî Rostem Xerzî**

### RASTKIRIN

1. "Di hejmara duyemîn ya **Welat** de, di pelê 9, di beşê **Neqûşkê** de nivîsîneke kurt bi navê **"Mîna Çiroka sê Meymûnan..."** heye. Hin xwendevanên me muqayesekirina **Hikmet Çetin û Cemîlê Çeto** bi hev re wek neheqiyekê qebûl kirine...

Bi ser giş çewtî û kêmasiyên xwe de **Cemîlê Çeto** wek şêx, beg û axayên Kurdan yên din ku ji aliyê dewletê û zaliman hatine kuştin, perîşan bûne û ji ax û erdê xwe derketine şehîdên welatê me ne û ji sefên welatparêzan tene hesibandin."

**Abdurrahman Durre**

2. Di hejmara me ya çaremîn de, li rûpelê 11. navê nivîskarê nivîsa **"Folklara Botan" Beşîr Botanî** di bin nivîsa **"Avîsta û zimanê avîstî"** de bi çewtî hatiye nivîsandin. Nivîskarê nivîsara **"Avîsta û zimanê avîstî"** **Amed** e.

### Ferhengok

- Afirandin:** çêkirin, xulkqirin (yaratmak)
- Aştî:** sulh (barış)
- Bajarvanî:** medeniyet (uygarlık)
- Balafir:** teyare
- Bandûr:** tesîr
- Celeb:** texlît, cûre (çeşit)
- Çareserkirin:** hal kirin
- Çewt:** xelet (yanlış)
- Çewtî:** xeletî (yanlışlık)
- Damezrandin:** avakirin
- Dijîti:** muxalefet
- Evîn:** aşq
- Evîndar:** aşîq
- Nûçe:** xeber (haber)
- Nûçegehî:** nûçevan (muhabir)
- Pênûs:** qelem
- Rewş:** hal (durum)
- Ragihandin:** (ulaşım, iletişim)
- Sînor:** hidûd (sınır)
- Şoreş:** ihtilal (devrim)
- Taybetî:** Xisûsî (özel)
- Bi taybetî:** Nexasim (özellikle)
- Tevger:** hareket

### KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ... pê ve min bikin aboneyê Rojnâmeya **Welat**

Nav	:	
Paşnav	:	
Navnîşan	:	
<b>Bedelê abonetiye razînin</b>		
Li Tirkîyê	: Y. Serhat Bucak İş Bankası Çağaloğlu Şub. Hesap No: 379809	
Li Derve	: Y. Serhat Bucak İş Bankası Çağaloğlu Şub. Döviz tevdiat hesap No: 3113617	
	<b>Aboneyên hejâ,</b>	
Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyeka pelê razandina bedelê abonetiye bişînin. Navnîşana Welat Başmushahip Sok. Talas Han No: 16 kat: 3, No: 301 Çağaloğlu / İSTANBUL		
	<b>Tel-Fax: 512 12 87</b>	
<b>Mercên abonetiye</b>		
Li hundir		
6 meh	60.000	30 DM
12 meh	120.000	60 DM



# Hizb-i qontra digire ser camiyan

● Hizb-i qontra niha ji bi zorê dikeve camiyan. Dewlet jî xwe nebihîstî dike û bi vê yekê kêfxeş dibe. Hizb-i qontra bi şikleki xerib bi otobosan tene camiyan. Li camiyan xelkê tehdît dikin û bi zorê ji xelkê dixwazin li wan guhdarî bikin

Özcan Aydın

Berê Hizb-i qontra bi dizî û veşartî tişt dikirin gava ku ev nefîce neda, niha jî heşkere û vekirî digrin ser camiyan û xelkê û meleyên camiyan tehdît dikin.

Hizb-i qontra rojekê bi vî rengî dikevin camiyeke Batmanê bi navê Beşeveler. Melayê camiyê li wan hiltê:

"Hûn kî ne ku bi zorê dixwazin qise bikin, we ji kê destûr girtiye, bê izna min kes nikare li vê camiyê wezan bike". Li ser vê hêrsbûna melayê camiyê, Hizb-i qontra dibêjin: "Me ji xwedê destûr girtiye" û ji melê re dibêjin rûne. Piştî vê îmam ji camiyê derdikeve û dire mala xwe. Di nav qontaran û xelkê de mînaqêşe derdikeve û piştî re xelk jî berê

xwe didin malên xwe.

Rojêke din qontra berê xwe dan camiyeke li taxa 19 ê Gulanê û xelk tehdît kirin. Dewletê ji wan re tiştê negot. Me li ser vê meselê ji muftiyê Batmanê pirsî ka dîtina wî çî ye. Muftî got: "Hê ji îmamên camiyan ji min re kesî tiştê ne gotiye û ji ber ku ez jî memûrê dewletê me ez nikarim di derbara vê pirsê de tiştêkî bêjim".

Melayekî ku berî bi demekê pîr lêxistin xwaribû ev ji me re got: "Em giliyê kê li ba kê bikin, li ber çavên dewletê û herkesî digrin ser camiyan, ne mumkin e haya dewletê jê tune be."

## Dawiya vê dewletê xêr be

Li gelek deverên welatê me êdf jî bo çêkirina dawetan jî divê ji polis destûr were standin. Gava ku dawet bê destûr werin çêkirin, dikarin bibin sedema êrîşên hêzên dewletê û bi dehan kes bi rojan bikevin qereqol û nezaretxaneyan.

Bûyerek ku vê rewşê dafîne ber çavan, roja 14 ê Adarê li Amedê hate jiyandin. Li gor agahiyên ku gihîştine rojnameya me li navenda Amedê roja Şemiyê (14 ê Adarê) şahiyêke şeraniyê hate çêkirin. Piştî ku şeraniyê qediya û dema ku beşdar belav dibûn hêzên padarên taybetî (özel polis güçleri) êrîş kirin beşdarên şahiyê û li dora sed kesî



Naser Rezazi

girtin bin çavan. Di nava vî sed kesî de (ku ji hêla padaran (polîsan) ve bi kotek û lêdan piraniya wan hatibûn birîndarkirin), hozanê navdar Naser Rezazî jî hebû. Di domana êrîşa padaran de tembûr

û enstrûmentên hozan Rezazî jî hatine şikenandin.

Hêzên êrîşbaz digotin: "Hûn di bin navê şeraniyê de Newrozê pîroz dikin."

Di nava kesên ku hatin girtin de rojnamevanekî Elmanî bi navê Alexander jî hebû. Li gor ku em hatine agahdarkirin ji sed kesî çil (40) kes hatiye berdan, ên din hîn di bin çavan de ne.

Bi rastî tiştêkî eceb e. Li aliyekî serokwezîr Demirel dibêje Newroz dikare were pîrozkirin, li aliyê din jî kesên ku ji xwe re zarokên xwe dizewicînin bi gumana ku şahiya Newrozê çêdikin tene girtin. Dawiya vê dewletê xêr be.

## Piştî şehîdbûna Bayru çend gotin

Welatparêzê hêja Bayru, di roja 3 ê Kanûna 1991 ê de li Hezêxê bi destên qontir-gerila hate kuştin. Mîxaîl Bayru bi hevkarî û dilpakîya xwe, bûbû pi-


rek dostaniyê di nav Kurd û Asûriyan de. Lê Komara Tirkiyê, mîna bavpîrên xwe yên Osmanî xwest ku dîsa fesadiyêkê tixe nava herdu gelên-

bara. Hemîdiye Alayên Modern Hizbullah jî, navê wan Hizbullah e, belê tu eleqa wan û Hizbulahên bi rastî bi hev re tune ye, lê ajanên Komara Tirkiyê ne, piştigirîya wan kirin.

Lê dem ne 1800 û ne jî 1900 e. Dem 1992 e û îro li serê çiyayên Mezopotamya pêşmergek ARGK qise dikin. Îro li navçê birayetiya gelan qise dike. Provokasyon û rîpên kevnar, li nav guh û çavên xwediyê xwe dikevin û diteqin. ez dixwazim li ser birayetiya Kurd û Asûriyan çend nimûnên dîrokî binivîsînim û hinekî jî rîpên kedxwaran rêz bikim: "Gelê Aşûr di sala 1945 an de piştigirîya Kurdan kirin, ji bo avakirina Komara Mehabad-Dîroka Aşûriyan Prof. K.P. Matiyef."

Di sala 1910 an de li Hekariyê Komela Dostaniya Asûriyan vebû û herwiha Komela Kulturê a Aşûriyan vebû. Endamên Komelan bi gelemperî Aşûr û Kurd bûn Assyrians of Soviet Unions 1906-1914"

Di navbera Aşûr û Kurdan



## KONEVANIYA NUH

Zübeyir Aydar



### Ji kûlîsên meclîsê

Roja 15 ê adarê di parlamentoyê de, wekî rojên din axaftina li ser bûtçe dîsa dirêj dirêj dom dikir. Dem ber bi nivê şevê ve diçû. Wekî her car piraniya parlamenteran li kûlîsê rûniştibûn.

Saet li dora 23.00 a bû. Ez û Ahmet Türk li nêzikî mezla telefonê rûniştin. Em li ser rewşa xwe û rewşa welatê xwe diaxivîn. Me behsa biharê û Newrozê dikir. Wê şevê li Cizîra Bota şer bû.

Wê gavê me dît Orhan Doğan hat çû mezla telefonê. Piştî derket ew jî hat li rex me rûnişt. Me pîrsa Cizîrê jê kir. Ewî got; Ez niha jî bi Cizîrê re axivim, ditêjin dengê topa tê, li her derê bajêr panzer digerin û li hawîrdorê xwe bê armanc bereka direşînin. Tu kes nikare derkeve der ve. Berik li gelek avahiya ketine, pîr cam û şivak şikestine. Agir girtiye dikanekî û li dora xwe fireh dibe. Itfaiya Cizîrê tere nakin. Gel nikare derkeve der ve ku agir bivemrîn e. Li ser van bûyîna ez bi waliyê mezin (super walî) û waliyê Şirnex re peyivim. Ewan gotin, emê şer bidin rawestandî û ji bo vemirandîna agir ji itfaiya Silopî jî rêkin hewara wan.

Me di nava xwe de ev axaftinên han dikir, wezîrê karê hundir İsmet Sezgin hat çû mezla telefonê. Piştî çend deqîqa derket û ber bi me ve hat. Piştî çend peyvên li ser piya ew jî hat li rex me rûnişt û me civat germ kir.

Pêşî me têk da behsa şerê Cizîrê kir. Me got; çima panzer berika berdidin mala, şer li rexa bajêr li hêla tabûrê çêbûye, çima panzer tene sükê, çima leşker nahêlin xelk derkevin herin agir bivemrîn. Ev agir niha neyê vemirandin, wê nivê Cizîrê bişewite. Ewî got; malava, sebebê vî karî û van bûyîna PKK ye. Ez ji van bûyîna agahdar im. Min ji karbidestê mintiqê re gotiye, hun hay ji gel hebin û agir bivemrîn. İnşallah tiştêkî mezin nîne.

Piştî van peyva me behsa Newrozê kir, Me got; Newroz cejna Kurda ya neteweyî ye, wê bê pîrozkirin. Divê vê pîrozbahiyê polis xwe têkilî nekin. Divê bi serbestî bê pîrozkirin. Wî jî got; li ser vê yekê me ji waliyan teva re genelge şandiye. Wê Newroz bi serbestî bê pîrozkirin. Belê haya we jê hebe ku tiştên bê qanûnî çê nebin.

Me jî jê re got; ev cejn e, şahî ye, herkes dixwaze cejna xwe di xweşiyê de biborîne. Dema leşker û polis xwe têkilî nekin tu tiştên nexweş nabin.

Piştî van axaftina civata me hêj germtir bû û çend hevalên din jî li dora me civiyan. Mesele hat li ser pîrsa kurdî û PKK ê. Me got; lazim e hun dev ji vê siyaseta xwe ya kevin berdin. Ev heftê sal in dewlet dibêjî Kurd tunene. Ev siyaseta di binyata wê de hişkî (şiddet) heye, lêdan heye, îşkence heye, talan heye, sirgûn heye, kuştin heye, qelandin û qirkirin heye. Ev siyaseta li ser bişaftinê (asimilasyon) hatiye avakirin û tixumperest e.

Bi vê siyaseta ev pîrsgirêk nayê helkirin. Lewre ev heftê sal in şîn û girî ji vî welatî xelas nabe. Pêşya her tiştî, divê şer bê rawestandî û her tişt bi axaftinê, bi prensîpên aşîfî û demokrasîyê bê helkirin.

Wî jî got; hûn xweş dibêjin, lê belê hûn guhdariyê me nakin. Hûn çima pêşberê PKK ê dernakevin, hûn çima nabêjin PKK terorîst e, hûn çima eşkere pêşberê wê de têkoşin nadin. Piştî çend bersivên hevalan, min jê re got; îro di qeydê wezaretê te de tê xwiyan ku 29035 çetê (korucu) we hene. Em 20 kes parlamenter jî wekî gotina te bikin, xwestina te bînin cih wê hejmara wan bibe 290055. Wê hingê em êdf nikarin herin nav gelê xwe, wê gelê kurd bêjin "ew çûn rehetî dîtin, bûn xayîn û çûn". Wê herkes bi çavê xayîna li me binêre. Cihê me êdf li nava gel namîne. Ev pîrs bi awayê gotina te nayê helkirin. Werin bi dilekê pak em tev de rûnên, biaxivin, rêya helkirinê em tev de bibînin.

Piştî van axaftina wekî ku bêje, wele rast e weke gotina we ye, bi awayek wiha serê xwe hejand û destûr xwest rabû çû.

de, ji bilî problemên eşîrî biqelînin. Tirk derketin seyda pêve, tu caran kîn û buxîz nehatiye kişandin. Herdu alî jî zarîwên cihekî ne -Raporek li ser gelê Asûr W.A. Wîgran - 1920"

"Bapîrên min di sala 1915 an de derbasî Rûsyayê bûn ji ber qirkirinê bazdan, Tirkan xwestin ku Asûriyan ji kokê ve

Bi silavên biratî û dostaniyê Neramsin Ewrohozo Welatparêzek Aşûr li Siwêd



# San Marino: em û dewleta cîranê me

R. Cizre

Berî çend rojan di ezmanê Yekîtiya Netewan (YN-Bi tirkî BM) de, aleka nuh hate bilind kirin û navekî din li listeya navên welatên serbixwe zêde bû. Jimara endamên YN bû 175. San Marino ya berê nema ye. 32 hezar mirovên vî welatî êdî bûne xwedî al û serok û di nava wê eywana mezin ya YN de, ji xwe re cihêki runiştinê dagîr kirine. Niwênerên wê dewletê êdî dikarin li ser masê li kêleka niwênerên Dewletên Yekbûyî yên Emerîka (Bi tirkî ABD), Rusya Federal û Çînê rûnin.

Eger mirov ne zikreş, çavbirçî û xêrnexwaz be, helbete li hemberê tabloyeka weha gerek e dilê mirov fireh bibe û mirov kêliyên şahî û xoşiyê bijî. Belê, ji vê pirsê min mesajeka nuh girt, baweriya min ji bo avakirina welatekî serbixwe û azad hîn xurt bû. Ji xwe dilê min ji jiyana bindestî û koletiyê tijî kîn e. Vêca bi vê mebestê min careka din, di nava xwe de gotinên xwe du carî kirin: "Ma dibe Kurd bi vê jiyana bê şeref, bê oxir û reş û tarî razî bimînin". Bi rastî, ji nava dilê xwe dibêjim: "Pîroz be San Marino, bila her hebe San Marino, belê, eger li gora prensîpên YN mafê çarenûsî (Self-determinasyon) ji bo 32 hezar mirov tê pejirandin (qebûl kirin), çawa dikare ji bo 30 milyon tune be.

Ev çiyê? Kîjan bê şeref dixwaze ev statuko bidome. Mane gundiyan me ji 32 hezar mirov bêhtir in. 32 hezar gerîllayên PKK'ê jî bi qasî San Marino ne. Cizîra Botan jî hîna di sala 1980'î de 32520 mirov bûn. Kerboran bi serê xwe dewletek e. Meşa Vedat AYDIN çar dewlet in. Kurd jî tev bi hev re, li gora vê pîvanê hezar dewlet in.

Ev rastiyeke e, belê her kes dizane ku di wê eywanê de, ne pîrensîpên YN, lê prensîpên mala Sipî û Pentagonê dimeşin. Hemû kilitên salan û joreyên

● Pîroz be San Marino, bila her hebe San Marino, belê, eger li gora prensîpên YN mafê çarenûsî (Self-determinasyon) ji bo 32 hezar mirov tê pejirandin (qebûl kirin), çawa dikare ji bo 30 milyon tune be.

● Sala par me gelek tişt kirin. Îsal emê qiyametê bi serê wan de rakin. Emê jî xwe hinekî har bikin û diranên xwe nîşanê wan bikin. Dewleta mêrikê kar bila xwe nas bike û me jî nas bike.

(odeyên) wê avahiya bilind jî, destê, destikê CIA, Georg Bush de ne. Lê belê, bila kes xwe nexapîne. Ew çî "sîstema Cîhanî ya nuh" e ku, nikarî dersekê bigere Saddam û ji heq wî derkeve? Kanîne prensîpên azadî, wekhevî, demokratîk û mafên mirovan? Helbete xema Georg Bush ne em in. Xema wî petrola me ye, ew jî vê rojê di destê rejîmên tirk, ereb û farisan de ye.

Gotinena gelê Tirk yê cîrane me heyê dibêje: "Rim di tîran de nayên veşartin". Bav û kalên me jî gotine: "diziya kadîne eşkere dibe". Yani rastî nayê veşartin û mafdarî tim bi ser dikeve, her tişt zelal û xuya dibe. Çiroka welatê me jî ev e. Ma ne bes e ev e heftê sal in, xwîna me ziwa kiribûn, zimanê me girêdabûn û li piştê me siwar dibûn.

Niha me daye ser rê, heta sed

salan jî pêşiya xwe em dibînin. Her çiqas San Marino jî tê bîra me, em hinekî din hevî didin xwe û dibezin. Rawestan tune ye. Heta roja ku serok beyan nameya Serxwebûnê di TV ya welat de bixwîne û jê bi şûn ve jî emê bibezin. Veger nîn e. Di ferhenga mirovên çê de gotina revê cihê xwe nagire. Her kes dizane jin û zarokên serhildanan agir berdane wê gotinê û li şûna wê ev gotin nivîstî ne "Serkevtin, serkevtin û dîsa serkevtin". Eger San Marino hatiye guhertin, em jî tîra xwe hatine guhertin. Xortên me berê xwe ji patexta wan dane guhertin û ketine taborên dirêj li hêviya çûna Gabarê, Cûdî û Herekolê ne. Jinên me, ji nava çar diwarên xwaringehê (mutfahê) derketine, êdî nizanin li ser zarokan jî porê hev bikşînin. Bêkariyê jî, ji welatê me barkiriye, hemû karêkêrên welat jî ji bo xwe kar dikin. Pir kêr çend lib û mibên rewşenbîran mabûn eve wan jî dest pê kiriye tîr. Trêna dimeşe

û yê jê bimîne, welleh wê xweli li serê wî bibe.

Sala par me gelek tişt kirin. Îsal emê qiyametê bi serê wan de rakin. Emê jî xwe hinekî har bikin û diranên xwe nîşanê wan bikin. Dewleta mêrikê kar bila xwe nas bike û me jî nas bike. Trafik tije kirine seriyên diplomatên wan di riyane de li hev dikeve DEY, Almaniya, Iran û Asiya navîn wan xelas nakin. Bila xanimê jî neçe nav creban. Şerm e, êdî Ereba bi lîvên sor paqên sipî nayên xapandin. Ez bawer dikim Sûriye jî guh nade mirovekî dayka wî bi tirkî nizan e. Badîhewa diçin dên, ma ne mesele li ber derê mala wan e, xwediyên meselê jî li ser erdê welat in.

Sala 91'ê derbas bû, belê li dû xwe gelek serpêhatiyên mezin hiştin. Ji bo vê salê jî amadekarî tewaw bûne, em tam hazir in. Duh roja erefatê bû, îro şerefata e, sibe roja cejnê û şahiyê ye.

Em, roja cejnê jî nasekinin, emê bibezin.

## Werin daholan gurme-gurme!

Dilbixwîn

Xendevanên bi rêz û rûmet.

Berî vê nameyek ji welat gihiştê destên min. Min ew bi dilê xwe ve guvaşt, du-sê caran xwend û bi ser de keliyam. Ji ber ku nameyê gelekî giranbûna bû, min xwest ji we re jî bixwînim. Ew ne tenê nameyê; ew jî dil û can bangek e ji hemû Kurdên ku li derveyî welat dimînin re.

Min naveroka nameyê weke ku hatibû hişt, tenê hunandina wê ya wêjeyî guhert. Werin em bi hev re vê nameyê bixwînin;

"Werin...!

Hûn li benda çî ne, li hêviya çî bobelat û serpêhatiyê ne, ji bo çî destên xwe li pêşiya van tolaz û xwenenasan vedigirin, ma gelo

rûmetdarî erzan e?! Belê, divê hûn werin, hûnê jî bo çî neyên, we hûn çî divêt, hûn jî vê serfirazî û serbilindiyê bêhtir çî dixwazin? Ev in, gul geş bûne, nêrgiz bişkivîne, heyv û stêrkên li banî tîra dilê xwe dikenin û pîroz bahiyên serkevtinê pêşkêşî mirovahiya pêşverû dikin, ezmanê reş û tarî, yê ku ev çar hezar sal in xwe bi ser me de vegirtiye û nahêle em serê xwe hildin, roj bi roj kunên mezin tîde vedibin... Ev in, bûk destên xwe hene dikine, zava simbêla badidine, zarok awirên tûj dikişînine, dayîk bi dengên xwe yê xwîr û bilind dizilxiştînine û bav berikên zarokên xwe yê 7 salî tijî kevir dikine, dest li piştê wan dixine û wiha dibêjin: "Lêxe ez bi qurban! Lêxistin şeref û rûmeta me

li me vedigerîne, seriyê me yê çemandî bilind dike, roja me ya merbendkirî hiltîne û me di nava mirovahiyê de, egîd û pehlewana dide diyarkirin..." Belê, dema ku ziman nikaribe rewşê jî hemû aliyên wê ve şirovebike, tenê dikare wiha bibêje: "Li welatê Medya, li ser hembêza dergûşa bajarvaniyê li mezopotamya, govendeke germ digere, dîlanek geş bûye... û her kes dixwaze ji bo jiyane bimire, ji vê serkevtinê bêhtir?

Li min negirin, hevok xwe dirêj dikin, bêhnok û xal xêzan nas nakin, sînoran diqetînin û ew jî dixwazin serbest bijîn.

Werin...! Ev der niştimanê jiyane ye. Hûnê jî bo çî neyên? Li Ewropa hûn dikarin ji bilî bêrûmetiyê çî bi dest xwe ve bi-

nin?

Ev der navenda xwedîderketina li kelepor û rûmetiyê ye. Ev der kela berxwedanê ye, cihê şeref û namûs û bilindiya welatparêziyê ye! Ev der hola gurme-gurma dahola azadiyê ye, dengê zirneyê bangê li we tevan dike, "vegerin, werin, jiyana li welat jiyane, jiyana li dîrî welat mirine". Li vê derê kes nabêje "ez ne ji welat em", her kes jî berbang û serê beyanê ve mîna teltika tîfîngê amade ye. Bi rastî wateya jiyane ev e.

Werin...!

Bi milyonan, ji heft salî heya heftê salî li benda hatina we ne. Bi wî dilê xwe yê birîndar pêrgîna we tîne. Bi piştgirîya we xwîr dibin, hevalbendiya we kevirê di dest wan de mîna birûskê di nava çavên tankan de lêdikeve. Bi hatina we agirê li ser çiyên veketî gurr dibe û pêlan ber bi ezmanan ve hildide.

Bes e, êdî çavên me li ser rîya hatina we westiyane. Êdî di dilê me de bû hesret, bû kuleke giran gelo hûnê kengî werin! Ji we tîka dikim, ji hatinê netirsîn, ji slogan û dirûşmeyên mînalane netirsîn, ji kerwanê serhildan û rapêrîne netirsîn, ji meşa şervanên azadiyê netirsîn! -Bila li dilê we nemîne, niha em gotinan bincil dikin û dibêjin, lê di demeke din de emê wê cilikê biçirînin û ji we re her tiştî eşkere bibêjin. Hinekî bêhna xwe fireh bikin. Ne dîr e ku roja azadiyê roj başekê li we bike.

Werin...!

Emê destên hev biguvin, emê hev hembûz bikin, emê hev ramûsin û ji dil bi hev re bike-nin. Bila ew hêviya di dilê wan de biqurçife.

Çavên me li rîya we ne, dilê me jî bi we re ye. Heya hevditîne bimînin di xweşiyê de..."

## GOTÎN

Yaşar Kaya



### Gundê me

Li derdorên xwe binhêrin em giş ji gundan hatine bajarên giran û sivik. Di nav me de bajarî jî hene. Lê belê ev ana hindik in, bi qasî me nînin. Dehpazdeh salan berê tîrsek di dilê me de hebû. Me digo kî here bajarên mezin wê zimanê xwe yê zikmakî ji bîr bike, wê ji koka xwe biqete wê welatparêziyê jî ji bîr bike.

Belê îro tîrseke wisa ne maye; ne Kurdên Îstebolê, Enqerê, Izmîrê, Entabê, Ruhayê, Bedlîsê, Xunîsê, ne jî yên ku çûne Londrayê, Parîsê, Siwêdê, Holandayê welatparêzî û hesreta welatê xwe jî bîr nekirin. Bi serde jî çavên xwe li dinyayê vekirin, nihêrin ku gelên dinyayê çî dikin û çawa

pêşde diçin.

Çawa dibe bila bibe, wexta ku tu ji gelê me dipirsî xewna gişkan gundên wan in, warên wan in, dibêjin: "Bihar tî niha li zeviyan me genim wê biserîdîn çeh ê zer bin, li zozanên me wê gul û sosina vekin, dest bidine destê hev, qîz û bûk wê bixemilîn, dêrê û kurtikê xwe li xwekin kofiyê xwe bidine serê xwe şal û şemaqîyan bidin ber kofîyan wê xizemên xwe tîxin pozê xwe, morî û mircanan tîxin stuyê xwe çêrê xwe hildin, satîlan hildin herin ber avê, herin ser kaniyê.

Xortê gund jî wê tûncik û teeliyên xwe şeh bikin. Şal û şapikê xwe lixwekin ber bi wan zeriyan ve herin du sê pirsan ji hev re bêjin, kesera dilê xwe, agirê dilê xwe damîrînin, bi hev re herin dîlanê yan jî bin darekî."

Li welatê me hatina Adarê bi wan xilas nabê pez û dewar hêdî hêdî ber bi zozanan ve diçin, şivan û gavan sibehê zû radibin tûrê xwe hildidin sa û tîjîyan didin pey

xwe hêdî hêdî bilûrvan li bilûrê dixin pez dîherike. Li ber konê reş kebanî dew dikilîn runê nivîşk hildidin. Nezîkiya nîvro nanê palan diçe mîng û zeviyan, serê êvarê siyarên gund, ji arane tîne zozanan zarok dirêvin mîzgîniyê didin malan. Serê esrê pez tî bîriyê, berîvanên me satîlan hildidin diçine beriyê, pez didoşin, şîrê germ dikin penîr.

Carna li zozanên me teyrok û şîlî dibare ewr û esman reş dibin çav nabîne, brûsk lê dixê. Qîzên xama, yê êdî ber bi mîrê direvin sing û çîta dişîdînin. Berxê virnî dikine ber kozê. Ser hêlekanên zarokê virnî de kulav û xalica datînin. Kal û pir li der dora tendûrê rûdînin bahê sar tî, pey de dejnîk dido şîlî dibare. Tu diniherî jî wê çend deqan şûnda şîlî xilas bû keskûsor derket, tavê da. Zarok ber bi keskûsorê ve direvin û ji xwe re dilîzin. Bîna misk û Enber ji xwe-liyê tî. Gul vedibin, beybûn vedibin heşnayî heşîn dibe zozan dibine xêra xwedê. Ev zozan û ev gund çawa nekevîne xewna me.



# Erzîncan hejiya: Nezîkî 1000 mirî

Zelzele Erzîncanê xerakir: Piştî zêde 1939 a bi 53 salî jî nuh ve li Erzîncan kevir li ser kevir nema.

Sazendên resmî ji bo miriya 500, ji bo birîndaran jî li ser 1000 î hejmar dibêjin, lê ji rastiya van hejmaran tu kes bawer nake. Ji ber dewlet di xerabûna Erzîncanê de gelek bi qebahet û bi sûc e. Piştî zelzela 1939 a ku 40.000 kes miribûn, li Erzîncanê avakirina avahiyên bilind qedexe bûbûn. Lê sistema bûrjûvazî di karê xwe de, tu bend û qedexebûn nasnakirin. Dewlet jî li biryara (qerara) qedexebûnê xwedî derneketiye û rê li ber van avahiyên bilind negirtiye. Avahiyên ku xera bûne piraniya wan yê bilind in.

Du roj piştî zelzela Erzîncanê zelzele li Dêrsimê jî xist. Li Dêrsimê û qezayên wî gelek avahî xerabûn. Di nav Dêrsim û pulumur de aşîr rê girt û tu ragihandin di navbera



bajar û gundên herêma Dêrsimê de çê nabin.

Zelzele hêjî cih bi cih dom dîke û mirovên ku li wan de-

ran dijîn li derve radiwestin û newêrin têkevin avahiyên xwe. Dewlet jî şandina alîkariyê pîrr giran digire.

Tu organîzasyonê baş nehate kirin. Alîkariyê ku ji derve tîne û yê ji der û dor hatine civandin di dema xwe de

nagihîjin cihê xwe. Dewlet hew propagandaya xwe dike û ji wê pêştir jî bi kêrî tu tiştî naye. Rojnamên Tirkiye jî di nav van propagandeyên de cihê xwe digrin. Di manşetên wan de hertim behsa qehremaniya 'Mehmetçik' heye. Tu yek rasti yê pêşberî gel nake. Li gora nûçeyên ku digihên me xelkê Erzîncanê bi ser walî de digrin û vê rewşê protesto dikin. Ev hêrs û muxalefeta xelkê li dijî dewletê roj bi roj zêde dibe û bi protestoyan xwe tîne ziman.

Partiya Keda Gel (HEP) jî li Îstenbolê tevî teşkilatê xwe kampanyakî ji bo xwindayîne vekir. Roja 17.3.1992 saet di 08.00-09.00 li nexweşxana Capa yê wê bicivin û xwîn bidin. Wekî din jî ji bo piştigiriya xelkê Erzîncanê wê alîkarî bê civandin (pere, çadir, derman, xwarin bataniye û wek din). HEP jî bo vê kampanyayê bangî hemû kesî dike û alîkarî dixwaze.

## Jin meşiyar

Kulîlka Hêzeran

Ev zêdeyî hefteyekê ye ku di ser 8 ê Adarê, Roja Jinan re derbas dibe. Belê livbaziya jinan hê jî berdewam in û nema-ze li vir, Îstenbolê roj tune ye ku rojname behsa çalakîyê jinan nekin.

Bi minasebete 8'ê Adarê ku Platforma Jinan ji ber pirsên burokratik nikaribûn di wextê xwe de û bi serbestî bikin,

jinên radikal û demokrat li ser navê "Gelî jinan ber bi pêş ji bo rizgariya me", roja 15 ê vê mehê xwepêşandane (mitîng) li dar xistin û li meydana Üsküdar Bağlarbaşıyê li dora 800 jinên milîtan civandin.

Li ser riya meydana Bağlarbaşıyê, di nav sefên jinan de hevalbêndên YKD jinên welatparêz bi kincên xwe yê nek, sor û zer bala herkesî dikşandin ser xwe. Jinên Kurd bi lîlandin

û bi sloganên kurdî gava ketin meydana bi grûbek mirovên nîjadperest û faşîst re hatin hember hev. Ev grûb xwiyaye bi şewir û bi tedbîr hatibû meydana xwepêşandane û di nav wan de jî gelek mêr hebûn. Grûba nîjadperest (ırkçı) bi cinew û xeberên nexweş raserî me hatin û xwe dan tenişta padarên (polisên) meydana.

Giş kesên di mitîngê de axivîn ji ber ku rê nedan xwepêşandan bi awayekî destûrî ku di wextê xwe de bê kirin, hikûmet protesto kirin û ev slogan pîrr çendcar kirin: "Bijî yekîtiya berxwedana jinên Kurd û Tirk".

Jinên welatparêzên Kurd ev slogan bi zêdeyî digotin: "Kurdistan wê ji bo faşîzmê bibe goristan, Bijî serhildana jinên Kurd, Bijî 8 ê Adarê, Bijî Newroz, Bijî serhildana Biharê, Jin û mêr em bihev re berê xwe bidin Botanê".

Van sloganên ew grûba faşîst hê zêdetir har dikir û wan jî ev sloganên jêrîn davêtin: "Tirkiye ya Tirkan e, PKK xulamê Ermeniya, Li dijî PKK milên xwe bidin hev, Ev der ne Kurdistan, belê Tirkiye ye" (wa diyare nêjadperestên Ülkücü jî hebûna welatêkî bi navê Kurdistan qebûl dikin). Ülkücüyan al û beyraqên Tirkiyê dihejandin, carcaran nav di hev de didan û êrîş tanîn ser jin û zarokên nav xwepêşandane. Ji bo ku provokasyon û tehrîk çênebe Jinên Platformê berî wextê xwe, xwepêşandane temam kirin. Nîjadperestan bi taybetî piştî mitîngê jî êrîş dikirin ser zorok û jinan. Jinên Kurd berê tedbîrên xwe standibûn, li otobosên xwe siwar bûn û ji meydana dûr ketin. Bi vî awayî rê li provokasyonê mezin girtin.

## Hikumeta qalîsyonê ji esker pêve ji tu kesî notên baş negirtiye

Gazînen ji hikûmetê xêne kirin her roja xwedê hinekî zêdetir dibin, gazî hêdf hêdf dibin xeber, rexne û dijiyatîyên xwîrt.

Berî bi demekê hikûmetê sed rojên xwe yê ser kar temam kir. Bi vî minasebetê gelek avahî û sazûmanan, hikûmetê çi kir û çi nekir, çendî û çiqasî li gotînen xwe xwedî derket pîvan û wezinandin?

Weqfa Mafên Mirovan li Enqerê raporekî nixandîne amade kir û pêşkeşî raya giştî kir.

Di vî raporê de ji awira mafên mirovayetî û azadi-

ya fikrî, ji awira rewşa işkencê, ji awira serbestî û neserbestiya çapemenî û wêşanê û dawî ji awira ewlekariya jiyane sed rojên hikûmetê girtin berçav û raporê xwe amade kirin. Netîce bi awayê jêrîn.

Kuşînen qatîlên wan ne-nasin 39  
Êrîşên bombeyî 14  
Êrîşên çekdarî 29  
Êrîşên birîndarkirinê 58  
Mîrinên di bin çavdêriyê de 3  
Îşkenc 63  
Kuşîna bi komikî û gulebarankirina xelkê 23  
Kuşîna mal û sikakan 11

## Qirkirina Helepçe protesto bû

Li zanîngeha Gazî û ODTÜ, xwendevanê Kurd û Tirkê welatparêz jibonî qirkirina Kurdê Helepçe panelek çêkirin, xwendevanekî sazûman-karê civîne di belavokê de qirkirina Kurdê Helepçe û kotekiya ku Dewleta Tirk, li ser Gelê Kurd dike protesto kirin, ji biratiya Tirk û Kurda axiftin, şî-ar avêtin û merşa Ey Raqîb xwendin. Pey de xwendevan belabûn.

## Karkerên belediya İzmirê, ji 9 ê Adarê ve di rojiya birçîbûnê de ne

80 karkerên belediya İzmirê, li Enqerê di Sendîqa Belediyê de ketine rojiya birçîbûnê, karkerê belediyê, vî carê di berxwedana xwe de weke cara din nakin; heyanî ku mafê xwe nestênin na rawestin.

Ji bo parastin û bidestxistina mafên xwe.

Ev cara duyemîn e ku ev karker dikevin rojiya birçîbûnê.





**DİMILKÎ  
[ZAZAKÎ]**

**'Xwirteya ziwani pabestey xwirtey  
yan zî bê hêzeya millet a' (2)**

Embaz Malmisanij, eke ti wazenî nika zî ma biney (tikê) şîweyanê Kirdkî ser o xeberî bîdî. Bizanayîşê mi gore Kirdkî di çend şîweyê estî û beyntarê nê şîweyan di zaf ferq esto. No semed ra mesela yew Kirdo Dêrsimij û yew Kirdo Piranij yewbinan ra fahm nêkenî. Gelo ganî (lazim o) ma se biki ki ma bişî yewbinan ra fahm biki û şîweyanê xwi qe nêbo nuştîş di-nizdî pê biki?

— Rast a. Kirdkî di çend şîweyê estê û zekî mi cor ra zî va, ma hima şîweyanê xwi hemîni zî weş nêşinasnenî. Hetta ma hima nêzanî ki kam lehça ma kura (kotî, ça di) yêna qisekerdiş zî. Yeno mi vîrî, çend serrî ra ver mi yew kovarî (dergi) di namey cayanê ki Kirdkî te de yeno qisekerdiş nuştî. Yew embaz rojê mi ra persa va "Yaw ti ehendi Zazayan kotî ra vecenî?" Seki ma hetî vanî, mi va "Datîza, qey ez yîni vejena, ê xwi ra estî? eke Motkî di Zazay çinêbî, ez şîna Motkî ra Zazayan veja?" Kirra qali ma realîta xwi weş nêzanî.

Zanayîşo ki ez zana, şîweyê Kirdkî yê muhîmî nê yî:

**Şîweya Dêrsimî:** Kirdê Dêrsimî, Ezirganî, Gumgumî (Vartoy) şîweya Dêrsimî qisey kenî.

**Şîweya Motkan (Modkan):** Kirdê mintîqa Motkan, Sason, Hezo (Kozluk) û Hewêl (Baykan)î şîweya Motkan qisey kenî.

**Şîweya Çewlig (Bingol) û Paloy:** Kirdê mintîqa Çewlig û Paloy na şîwa qisey kenî.

**Şîweya Sêwregî:** Kirdê Sêwregî (Siverek), Çermûgi (Çermik), Şonkuş (Çüngüş) û Alduşî (Gerger) şîweya Sêwregî qisey kenî.

Şîweyanê binan gore nê her di şîweyê peyenî pê manenî. Beno ki merdim şîno nê her diyan yew şîwe zî bihesibno.

Kirdkiya cayanê binan ra mesela Kirdkiya Piranî, Hênî, Licê, Pasûrî (Kulp) û Gêlî (Eğil)-tanîni merdim şîno şîweya Çewlig û Paloy ser o, tanîni zî şîweya Sêwregî ser o bihesibno.

Kirdkiya nê cayan ra tanîni di tanî xusûsiyetê xamî zî estî. Mesela kirdkiya Gêlî di herunda vengê "V" di ge-ge "W" esto (Nimûne: herinda "vatiş"î di Gêlîjî vanî "watiş").

Gelo ma ganî se biki ki ma bişî şîweyanê xwi nizdî pê biki?

Ganî hetana ki ma dest ra yena ma Kirdkî qisey biki, biwanî û binusî. Verî eke ma Kirdkiya yewbinan fahm nêki yan zî weş fahm nêki zî ma do verra verra pê ra fahm biki. Fahmkerdiş gama verîna a. Semedê pê ra nizdîkerdişê lehçeyan rê kê ganî nê xususan ser o zî vindî:

a) Nuştîş di yeweya (yewbiyayîşê) elfaba

b) Nuştîş di yeweya îmla

c) Nuştîş û neşkerdişê ferhenganê mehelliyan (mesela ferhengê Dimilkiya Dêrsimî, Sêwregî, Motkan û cayanê binan)

d) Pêveronayîş û muqayesekerdişê kelîmeyanê ciya-ciyyan

e) Nuştîşê grameranê şîweyan

û muqayesekerdişê nê grameran

f) Him formanê kelîmeyan ra him zî formanê gramatîkan ra vîjnayîşê formanê rastan (raştan) Ez zana kerdişê nê karan asan niyo labelê şaro xerîb nîno ma rê problemanê ziwane ma hal nêkeno, ganî ma problemanê xwi hal biki. Roşenbîrî (aydınlar) û wendoxê Kurdan ganî nay weş bizanî. Zeki ma hetî vanî "Ganî ina beyndê ma di bitirînga" hem zî weş bitirînga. Zaf milletanê binan nê karê xwi kerdi, ganî ma zî biki.

Ewro (eyro) tanî bibo zî Kirdkî nusiyêno. Tanî nuştîşê nêwazenî kelîmanê xerîban (mesela kelîmanê Tirkî û Erebkîyan) binusî, cûka (aw semed ra) kelîman virazenî. Yeno mi vîrî yew embazî herunda "mekteb"î di nuştîşê "wendexane", herinda "telebî" di nuştîşê "wendewan". Gelo nika ra xwi hetî virastişê kelîmeyan ca di yo, raşt o?

— Herinda kelîmeyanê xerîban di vatiş û nuştîşê kelîmeyanê Kurdkî çiyêdo baş o labelê no kar zî asan niyo û herkesî ra nîna ki nê karî bi metodêdo raşt biko. Çi rê asan niyo?

Verê heme çî ziwane ma wayîrê çend lehçeyan o û dewletanê ciya-ciyyan di yeno qisekerdiş. Ewro welatanê ciya-ciyyan di organizasyonê yan zî kesê ki kurdkî ser o xebitîyênî estî labelê çî heyf ki zaf ray xebera nê kesan û organizasyonan yewbinan ra çîna. Zaf kes lehçeya xwi vîşer lehçeyanê binan nêzano, elfabeyanê Kurdanê binan nêzano û nuştîyênî yîni nêwaneno. Mesela dapançês milyon Kurdanê Kurdistanê Vakurî û Kurdanê Tirkîye ra belkî des tenî yê ki bişîni Kurdkîya Cenûbî biwanî û fahm biki zî çîni! Kurde Kurdistanê Cenûbî û Rohelati zî Kurmancîya Vakurî û Kirdkî (Zazakî) nêwanenî. Zaf Kurde estî ki tena lehçeya xwi Kurdkî rê binke (esas) hesibnenî.

Warey nuştîşî di halê Kirdkî (Zazakî) hina xirab o. Zaf nuştîşê Kirdî, Kirdkiya mintîqa xwi yan zî kirdkiya dewa xwi tena zanî. Şîweyan, lehçeyan û ziwananê binan, mesela Fariskî û 'Erebkî nêzanî. Ge-ge gramer û strukturê ziwane xwi zî weş nêzanî. Eger kesê winasî kelîmeyan virazî, helbet da (ko) zaf ray kelîmeyanê şaşan virazî. Virastişê kelîmeyan ra ver ganî ma bizanî kam kelîmeyê Kurdkî yî, kam kelîmeyê xerîb î? Eke merdim 'Erebkî, Fariskî û Tirkî

hewl nêzano, çî zano ki kam kelîma Kurdkî ya, Tirkî ya, yan zî 'Erebkî ya? Mesela zaf kelîmey estî ki ewro ziwane Tirkî di vajiyênî, labelê 'eslê yîni Tirkî niyo. Ganî ma lehçeyanê Kurdkî zî weş bizanî. Çîmkî zaf kelîmeyê ki şîweya ma di yan zî lehçeya ma di çîni, şîwe û lehçeyanê binan di estî. Virastişê kelîmeyan di, fonksiyonê sufiks û prefiksê kurdkî zî ganî weş bêro zanayîş. Mesela ti vanî yew embazî "mekteb" ra vato "wendexane". Çi rê vato wendexane, çî rê nêvato "wendexane"? Tanî nuştîşê Kurdkî "mekteb" ra vanî "dibistan", tanî vanî "qutabxane", tanî vanî "xwendexane", tanî zî vanî "zanîngeh". Tirê (ceba) ha-yiya nê embazê to nê kelîmeyanê binan ra esta, çîna?

Kirra qali, herkes key xwi di kelîmeyanê newan virazo nêbeno. Eke herkes cay di, xwi ser kelîmeyan virazo, seredejê

"Wa Tirkî (yan zî 'Erebkî) nêbo, çî beno wa bibo." Kesê enasarênî ge-ge kelîmanê Tirkî û 'Erebkî ca vardanî labelê herinda yîni di ziwananê binan ra gênî. Zeki ma hetî vanî "Her ni, kirri". Mesela herinda "qanun"î di tanî nuştîşê Kurdistanê Cenûbî se vajî rind o? Vanî "yasa". De naray tanî Kurde mayê Kurmancî zî nêvanî "qanun", nêvanî "yasa", labelê vanî "zagon". "Yasa" ti zanî çî ya çî kara ya. "Zagon" zî mevajî ki Bulgarkî ya. De ma kura Bulgarkî kura? Mesela herinda "ordu"y di ewro tanî Kurde vanî "artêş", na kelîma Fariskî ra girota (Fariskî ra zî şaş girota çîmkî Fariskî di "ertêş" a). Tanî Kurde "tarîx" ra vanî "berwarî". Viraziyayîşê na kelîma enteresan o.

Hewawo ki 'Ebdurehman Zebîhî vano, wexto ki 1943 di Tawrêz (Tebriz) di yê kovara Nîştîmanî neşr kerda, rojnamey Roja Nû kewto yê dest. Nê rojnamey di yew meqala biya, binê na meqala di zî wina (ena) nuştîbiyo:

"Berwarî, ... 1943". 'Ebdurehman Zebîhî vato qey me' na na kelîma "berwarî", "tarîx" o. Zebîhî vano "A se'eti ra pey, zeki ez di lûyan yew quli di vîna, çî çîyo ki mi neşr bikerdîni, îcab bikerdîni zî nêkerdîni zî" mi te de na kelîma "berwarî" herinda "tarîx"î di nuştîni. Mevajî ki "Berwarî" namey yew mintîqa wo, tarîx-marîx niyo. Zebîhî vano "Zeki

şîma vînenî, na kelîma bê dayk û bawka a, dayka ya cahîley û nezaney a, bawkê ya zî fanatîzmo korkanî yo. Rojo ki mi fahm kerd ki 'Berwarî' 'tarîx' niyo, mi hinî fek na kelîma ra verra da û mi na mesela zî zaf mîdîman rî vati. Labelê çî heyf ki hima zî merdimî estî ki fek na kelîma ra verra nêdawo." Zeki 'Ebdurehman Zebîhî zî vano, dayka zaf kelîmanê virşteyanê Kurdkî û na kelîmeya "berwarî" yew a, yanî cahîley û nezaney a, beno ki bawkê yîni ciya-ciya bî. Ganî ma na nimûneya (mîsala) 'Ebdurehman Zebîhî ra îbret bigîrî.

Ez hina derg nêkena. Nimûneya 'Ebdurehman Zebîhî nimûneyêda weş a. Labelê herkes heway 'Ebdurehman Zebîhî "otokritîk" nêkeno. "Otokritîk" qismetê her baba'egîlî nêbeno.

**Embazê ki biwazî Kirdki binusî, ti yîni rê çî salix dani?**

— Keso ki biwazê binuso, baş a ya ki nuştîyênî verênan û neweyanê binan zî biwano, ser o vîndo. Dim a ti ra îstîfade biko, şaşanê yîni tekrar nêko, raştanê

yîni biko sermayey ziwani û nê sermayî bi xebata xwi hina vîşî biko.

Hetî ra zî hetana ki merdim bişîyo (bişîno) ganî şîweyan û lehçeyanê binanê Kirdkî bander bo (bimuso). Ganî qe nêbo qafdeyanê esasiyanê gramerî û îmla bizano.


Herçiqaş ki ewro nuştîşî hina zaf şîweya xwi reydi nusênî zî ganî hetê gramerî ra verra verra kê formanê raştan tercîh biki. Eke tanî formî şîweya ma di çinêbî yan zî şaş bî, ganî ma formanê şîwe û lehçeyanê binan bigîrî. Yewna çîyo muhîm zî Kurdkî pejmîriyayîş (düşünmek) û Kurdkî nuştîş o. Ewro zaf Kurde estê ki binê tesîrê ziwane Tirkî di manenî, fikiranê xwi hêşê xwi di tercûmey Tirkî kenî, nusênî, Bêguman no çiyêdo şaş o.

**Embaz malmisanij, ma ti betelnayî? Ma wazenî rapor-tajê xwi tiya di biqedênî. Peynî di ti wazenî wendoxanê Welatî rê çîna (zewbî çî) vajî?**

— Ez nêbetîliyaya. Çîyo ki na gami yeno mi vîr û ez wazena vajo no yo: Ge-ge ez raştê tanî nuştan yena, te de yeno vatiş ki mesela Kurdkî, yanî mesela ziwani ehendi muhîm niya û cay ya sira peyeni di yo. Heta tanîni gore en peynî di dori yena Kurdkî. Vanî eke ma xwiser bî zî ma yew demewo derg pey ziwane Tirkî xwiserbiyayîşê xo îcra kenî. Herçiqaş ki mesela xwiserbiyayîş û azadiya millî serekê meselan a zî milleta ma rê mesela ziwani çiyêdo zaf zaf muhîm a. Kamî ki vajo "En peynî di dori yena kurdkî", şaş vano. Bi ziwane Tirkî "îcrakerdişê xwiserbiyayîşî" zî abîsan şaş o. Ziwane ma esto, ma çî rê ziwane şarî reydi "xwiserbiyayîşî îcra" kenî? Ganî fikiranê winasiyanê (enasarênanê) şaşan ser o ma weş vindî. Çîmkî xwiserbiyayîş çiyêdo formel niyo ki tena bi name yan zî bi yew bêraxî hal bibo, ganî milleti heme hetan ra xwiser bo. Ziwani fikir yewbinan ser o tesîr kenî. To çî ziwani qisey kerd, ti zaf ray ayhewa pejmîriyênî (düşünmüş benî). Ti ay wext biwazî nêwazî ti hetê fikrî ra pabeste benî. Yanî ziwani heme çî niyo labelê zaf çî yo.

Yewna çîyo ki ez wazena vajo no yo: Ziwani bi xwi çiyêdo şexsî yan zî grûbî niyo, malê cematî û millet o. No semed ra zî ewro kes, organizasyon yan zî grûbê ki ziwane Kurdkî ser o xebitîyênî, ganî yewbinan di yardim biki. Ez bi xwi verniya na xebat û yardimî di bexeyra nezaney, ehmeqey û rikdarey sebebna nêvîna. Ganî ma qe nêbo xebata ziwane millî di hesabanê werdiyan (şenikan) û grûbiyan ra fek verra di. Eke ma wazenî binê tesîrê politikaya asimilasyonîsta seserran ra xwi bifilitnî, ganî ma bi xwi politikayêda raştî taqîb biki. Eke ma politikaya grûbî ra ver politikaya anti-koloniyalîstî taqîb nêki ma senê dîşmenê kolonyalîstî di serî şonî?

**Roportajkerdox: J. Espar**





Roj bi roj keç û jinên Kurd nîrên koletiya xwe dişikînin

# Jinên Kurd ber bi jiyaneke azad ve dimeşin

● **Qutbûna jinan ji kevneperestiya malbatî û civakî pir bi zahmetî bû. Ji ber ku girêdanên sed salan hatibûn ava kirin û bûbûn weke girêkên kevir. Yek bi yek jinên Kurd wêrîn (cesaret) kirin û têkiliyên xwe ji malbatê qut kirin, li cem şoreşgeran cihên xwe girtin. Dayik û bavikên wan pêşî digotin, "Namûsa me çû"**

● **Keçên Kurd, dîtin ku azadî û jiyana serfiraz, di nav serê çiyaran de heye. Insanê ji bo rizgariya welatê xwe şer bike û şehîd bikeve ew di dilê gel de dibe insanê helî bi qiymet û bi rûmet. Fêhm kirin ku namûs welat e. Li welatekî bindest namûs herdem di bin potînen dijmin de ye. Jiyanêke bi namûs û şeref incax di nava şêkoşîna rizgariya neteweyî de ye ...**



Îroj di nava refên têkoşînê de gelek keçikên Kurd hene. Dema mirov hebûna wan di nava têkoşînê de dibîne, birastî dilxwaziya şer xwirtir û bilintir dibe.

Ne kevin; berya niha bi pazdeh-bîst salan jinên Kurd di mala xwe de û di nava civakê de hêsir û kole bûn. Cihê wan di nava şekalan de bûn. Di ti civatê de heqê axavtinê ne didan wan. Herdem ji bo xizmeta mêran amade bûn. Nika-rîbûn ji bo xwe bibûna xwediyê fikreke azad an karek azad. Herdem girêdayî bûn bi mêrê xwe ve yan bi birayê xwe ve. Her roj sed xeberdan û lêdan li ser serê wan weke qederekê hebû. Ji xwe li ser qedera welatê xwe nikarîbûn ne axaftin bikirana û ne jî bifikirîna. Ji ber ku ne dixwendin an di nava civakê de ne digeriyan herdem çavgirtî bûn.

Bi vî awahî jinên Kurd

mirî bûn, bindest bûn, kole bûn. Zilaman bi çavê sewalekê li wan dinerîn. Zewaca bi wan re ji bo şuştina cilik û firaxan û ji bo raketina livîna bû. Qet ne digotin, "Gelo ew jî insan e?" û li ser vê pirse fikara xwe kûr ne dikirin.

Bi destpêka têkoşîna rizgarî, jinên Kurd jî weke mirovên Kurd dest bi hişyarbûnê kirin. Pêşî yek bi yek hatin nava refên şoreşê. Di wir de hebekî xwendin û çavên wan vebûn. Fêhm kirin, Ji ber vê yekê xwendina ilmê sosyalîzmê kûr kirin û heqîqeta xwe hîn bêhtir fêhm kirin. Dîtin ku xelasiya wan incax bi xelasiya welatê wan ve ye û xelasiya welat jî incax bi şerê rizgariya neteweyî ye. Bi vê sebebê destê xwe ji jiyana kevin qut kirin û dest bi jiyaneke nuh kirin.

Qutbûna jinan ji kevneperestiya malbatî û civakî

pir bi zahmet bû. Ji ber ku girêdanên bi sed salan hatibûn ava kirin û bûbûn weke girêkên kevir.

Yek bi yek jinên Kurd wêrîn (cesaret) kirin û têkiliyên xwe ji malbatê qut kirin, li cem şoreşgeran cihên xwe girtin. Dayik û bavikên wan pêşî digotin, "Namûsa me çû".

Dijmin jî li ser vê peyvê gelekî sekinî û xwest ku bi malbatan bileyize. Qîzên ku digirtin dibirin îşkenceyê, dest diavêtin namûsa wan, ji bo ku wan bixînin nava xiyaretê. Dîsa qîzên ku di şer de şehîd diketin, tixtor dibirin ser wan, ji bo ku bêje "Ev ne keç in, ji kêfê derketine der, ne ji bo şoreşê." Lê qîzên Kurd ev listikên dijmin bi wêrekî (cesaret), biryardarî (qirarî) û fedekariya xwe şikandin, xera kirin. Bi salan li serê çiyê keç man, di zindanan

de can dan, sirra xwe nedan. Li hember îşkenceya dijmin bûn kelehên berxwedanê. Li serê çiyaran ispat kirin ku "şer şer e, çî jin e, çî mêr e."

Dem a ku gelê Kurd bihîst li serê çiyaran keçên Kurd şehîd dikevin, agir kete pozên

wan jî. Gelek zilaman digot "Xwelî li serê me be. Em jî ji xwe re dibêjin em zilamin" û rahiştin çek û rextên xwe û li kêleka wan cihên xwe girtin.

Keçên Kurd, dîtin ku azadî û jiyana serfiraz, di nav serê çiyaran de heye. Insanê ji bo rizgariya welatê xwe şer bike û şehîd bikeve ew di dilê gel de dibe insanê herî bi qiymet û bi rûmet. Fêhm kirin ku namûs welat e. Li welatekî bindest namûs herdem di bin potînen dijmin de ye. Jiyanêke bi namûs û şeref incax di nava têkoşîna rizgariya neteweyî de ye ...

Roj bi roj keçên Kurd rastiya (heqîqeta) xwe û welatê xwe fêhm kirin û berê xwe dan çiyayên welatê xwe li tenîşt kek û birayên xwe ketin nav têkoşînê, rizgariya gelê xwe geş û bilintir kirin. Beşdariya jinan ya nav têkoşînê, di tu demî de ne gihîştibu vê sêrê. Welat, bi şehîdbûna keçan geş bû, ava bû. Yek pey yekê derketin serê çiyê û hejmara wan gihîşte dehhezaran

Weke miriyê ku kefenê xwe biçirîne, keçên Kurd û jinên Kurd jî, xweliya mirinê ji ser çavên xwe avêtin çavên xwe vekirin û bi bîr û baweriyeke şoreşgerî serê xwe rakirin û olkên (zen-cîrên) koletiya hezar salan qetandin. Ji bo ku birîna wan gelekî kûr bû, rabûna wan jî gelekî xwirt çêbû. Li

hember dijmin rik (kîn) û nefreta wan ewqasî xwirt bû ku serokatiya serhildananan kişandin, ne tenê li sêrê çiyaran; li hemû deran, li gund û bajar, li deşt û newalan, li girtîgeh û zindanan; li hemû deverên welêt bê tirs û bibiryar xwe avetin peşiya her têkoşîna pêşverû û bi dar û keviran meşiyar ser qesasên keç û lawên xwe; toleya hezar salan hilanîn, bêhn û hêrsa dilê xwe, li ser serê dijmin rijandin.

Îroj jinên Kurd, gelekî pêşve çûne. Ji bo rizgariya xwe û ya welatê xwe him şer dikin, him serhildanan çêdikin û him jî xwe dirêsin, anku birêve dixin. YJWK yekitiya jinên Kurd têne ava kirin. YJWK di heftê meha Adarê de li El-manya, bajarê Bonnê Kongreya xwe ya yekemîn çêkir û di vê şevê de Heştê Adarê Roja Jinan pîroz kir. Ev jî bo jinên Kurd serbilindaiyeye gelekî mezin e.

Em 8 ê Adarê li hemû jinên Kurd û jinên şoreşgerên cihanê pîroz dikin û dibêjin ku di 8 ê Adara 1992 an de jinên Kurd, ji herdem bêhtir şiyar in, ji herdem bêhtir şervan in, serhildidin diqîrin, dixwînin, didin xwendin, teref-darên xwe zêde dikin; mafên xwe û yên gelên xwe dinasin û ber bi azadiyê ve bi gavên hîn xwirtir û zeximtir dimeşin.

Ş. Deniz





# Divê Kurd siyasetek baş, durust û bê tawîz bimeşînin

M. Ali Tüysüz

Di dîroka çîn, gel û civatan de yan jî di pirsên civakî de, bîrûbawerî û xebatên paşverû yên ku dixwazin rê li ber azadiya mirovan û pêşveçûna civatan bigrin bi giştî her demê hebûne û niha jî hene.

Li hember vê bîrûbaweriya kevnar, di her civatê de xebat û bîrûbawerî hene, ku dixwazin, mirovatî bi pêşve here û mirov bi pêşveçûyîna civakî bigihîje rewşeke azad, wekhev û serbilind. Di dîroka mirovatîyê de, ev herdu blokên bîrûbawerî, di warên siyasî û îdeolojîk de, her demê hebûne û li hember hev, xebatên cûrbecûr û bi awayên cihê li dij hev şer kirine.

Di navbera van herdu blokên dijber (antagonîst) de, gelek kategoriyên din ku dualî dilîzin, hene. Berjewendê (menfeetê) van kategoriyan bi awakî glemperî vê dixwaze. Gelek caran kîjan blok xwîrt û diwartir be, li ba wî cih digire û li dij a din şer dike. Lê di van kategoriyan de, grûbek yan jî komîkek heye, ku bi gotin û gelek caran jî bi nivîs alîgir û piştvanê şerê azadî, wekhevî û demokrasiyê dike. Lê bi xebat û danûstandinên xwe, gelek xesar û zirarê dide xebata ku ji bo azadiyê tê dayin; problem û pirsgrêkan li pêşiya şerê azadixwaz derdixe.

Heger em li vir, pirsê neteweyê Kurd û têkoşîna gelê me bi van xalan, ku bi kurtî li jor hatin diyarkirin ve girêdin û çend gotinan di vî warî de bibêjin, divê berî her tiştî em behsa qonaxa, ku xebata azadixwaz îro gihîştîye, bikin.

Ji dawîya sedsala paşîn vir ve, cara pêşin e ku em dibînin gelê Kurd berxwe dide û bi serhildanên xwe yê sistematîk ve, li her deverên welêt, li dij dagîrkeran û metodên wî yên hov derdikeve û rê li ber serîrakerîneke giştî vedike. Di dîroka me de, cara pêşin e, ku pêşengiya ku îro vê rewşa rêk û pêka xwîrt afirandiye, ji dîroka têkçûna têkoşînan gelê Kurd ders girtiye, bê tawîz, ji bo serkeftinê, dengê xwe bilind dike û şer ji bo jiyaneke serbilind û azad dide. Gelê Kurd ber bi yekîtiyê ve diçe û çareserkirîna pirsê Kurdan roj bi roj hîn nêzîk dibe.

Lê aliyê din, gelek sedemên ku dibin asteng û rê li pêşiya xwurtkirina xebata piralî û serkeftinê digrin, hene. Astengên ku em li vir nîşan didin, ne dagîrker û êrîşên wan yên hov in. Ev asteng diyar in û divê welatparêz, ronakbîr, xwendevan û hemû gelê Kurd pê zanibin. Ji ber ku di dîroka Kurdan de, hemû serîrakerînan ku têkçûne, bi tevayî bi van sedeman ve giridayî ne.

Ev sedemên ku riya rast li ber têkoşîna gelê Kurd tarî dikin

**Berî her tiştî divê were gotin, ku sedemê an jî astengên ku bêmafîya gelê Kurd heta îro domandiye, îro jî, wek do ne. Îro jî wek do gelek komik û şexsiyetên Kurd, xwe amadeyê xulamtiyê kirine. Pir eşkere ye, ku sedemên cûrbecûr hene**

û bi hebûna wî dilîzin çî ne? Bi çî awayî dikevin pêşiya serkeftin û serfiraziya gelê Kurd.

Berî her tiştî divê were gotin, ku sedemê an jî astengên ku bêmafîya gelê Kurd heta îro domandiye, îro jî, wek do ne. Îro jî wek do gelek komik û şexsiyetên Kurd, xwe amadeyê xulamtiyê kirine. Pir eşkere ye, ku sedemên cûrbecûr hene. Em dikarin ji wan hinekan li vir diyarkin:

Hêz û rêxistinên Kurd bi piranî nebûne xwediyê şexsiyeta neteweyî û di vî warî de nikaribûne gelê Kurd hişyarbikin.

Rewşenbîrên welatparêz û şoreşger roleke giring nelîstine û xwedî li wezîfe û erkên xwe demeketine.

Ji aliyê politîk, aborî, îdeolojî û leşkerî ve, xwe negihandine qonaxek e dijwar û xwîrt ku bikaribin xwe biparêzin.

Di pirsên afirandina berhemên hêja û hewcedarî yên din-ku gel organize dike û birê dixebatên ku divê bihatana kirin, bi awayekî pir sist û liberal hatine meşandin.

Serokên Kurdan gelek caran serokên eşîret û xwediyê herêman bûne. Ji bo vê yekê serokatîyên eşîrtî danûstandin û hevbendiyên (tifaqên) xwe de, eşîret û heremê xwe parastine û gelek caran roleke xwesipartî (teslîmkarî) listine.

Pirî caran hêzên Kurd wek dijmin û carna jî, bi dijmin re êrîşê şerê azadiyê kirine.

Mirov dikare van xalan hîn jî zêde û dirêj bike. Lê li vir, ev ne mumkun e. Li şûna vê em dê behsa çend bûyerên dîrokî bikin û ji xwe bipirsîn:

Heger Îdrîs-î Bîtlîsî di destpêka sedsala 1500'an de nebûya mirovê Yavuz Selîm û nêzîka bîst Beg û heremên welatê me, bi Osmaniyan ve girênedaya;

Heger di nivê sedsala 1800'an de merivê Bedirxan Beg, Yezdansêr û eşîretên din yên Kurd, serîrakerîna Bedirxan Beg ra xiyaret nekirana û Kurdan di dawîya 1800'an de cih di "Alayên Hamîdiye" de negirtana û li Îstebol û Bexdayê neçûna "Mektebên Eşîretan";

Heger "rewşenbîrê Kurd" Abdullah Cevdet û yên wek wî di dawîya sedsala 1800'an de tevî hevalê xwe Dr. Îshak Sûkukî



ve, nebûna sedemê damezrandina Îtîhat û Terakkî û karên kurdayetî durust bikirana;

Heger A. Cevdet şûna 70 pirtûkên xwe -ku ne li ser pirsên netewa Kurd încar pirtûkê ku riya rast nîşan didin binivîsandana;

Heger Kurdan, di şerê rizgariya Tirkîyê de alikariya M. Kemal nekirana û ji bo xwe bixebitîyana;

Heger Îhsan Nûrî, di salên 1927-30'an de, li Araratê xwediyê makîneka nivîsînê bûya û gelê Kurd yên herêmên din ew bi tenê nehiştta û di serîrakerîna Dersimê de lawê apê Seyid Rîza, Rêhber Seyid, Elîşer nekûştta û şoreşê re xiyaret nekira û Se-

yid Rîza teslîm nebûya;

Heger gelek Kurdên Başûr, C. Talabânî jî tevî van, di 64'an û dû re çehşîti nekirana, Mustafa Barzanî alîkarî ji îran, îsrail û Amerîka negirta û 1975'an de çek teslîmê dijmin nekira û nereviya ya;

Heger îro dîsa serokên başûrê welêt her roj neçûna cem dagîrkeran û negotana "Em welatekî serbixwe û azad naxwazin", lê belê teva têkoşînê bûna;

Heger rewşenbîr û welatparêzên Kurd Konferans û civînên bêencam û ne produktîf biterikandana û bi rastî welat biparastana, "demokrasiya" hikûmeta nû re çepîk lînexistana û ji bo pêşvebirina xebata kurdaye-

**Hêz û rêxistinên Kurd bi piranî ne bûne xwediyê şexsiyeta neteweyî û di vî warî de nikaribûne gelê Kurd hişyarbikin. Rewşenbîrên welatparêz û şoreşger roleke giring ne listine û xwedî li wezîfe û erkên xwe derneketine**

tiyê çend gav biavêtana;

Heger Kurdan, parastvaniya gundan nekira û hinek "Kurdên zana" li dij şerê ku îro tê dayin, zimanê dijmin bikar ne anîna, îro welat dê xwediyê jiyaneke serbilind bûya.

Em kin bibêjin: Divê Kurd, xwedî li ji vî mejiya şaş, xelet û pîs demekêvin. Divê Kurd dev ji va komik û şexsiyetên ku di vî riyê de dimeşin berdin û xwe tevê şerê serxwebûn û azadiya welêt bikin. Divê Kurd, li gelê xwe xwedî derkevin.

Divê hemû Kurd, prensîbek heye ku wê tim biparêzin. Ew jî ev e: "Siyaset nekirin, bi siyasetta xerab, kevnar û kevnepereşt ve mijûlbûnê çêtir e."

## XAÇEPIRS


Amadekar: Nijad Yaruk

### ÇEPEAST:

Daxwaza me ji bo cejna 21 ê adarê li gelê me. 2- Çê bûyî / Yên bi tiştêkî ve zêde girêdayî bin / Ji Şhekspir Tîpek qrala. 3- Celebek miqrobê / Dema li pêş, wêbê / Baneşanek eşê / Di metabolîzma însên de hûmên çêkerên bingeh. 4- Cephe / Cinavkê kesane yekemîn / Tiştêkî heta demekî ku mirov deyne cihêk / Plaqa Îsçoçya. 5- Aletekî bênderê / Fûrandina bêhnê / Bi erebî ez. 6- Pere / Perê Rûs. 7- Zana / Di tipê de navê Serhestiyê gulover. 8- Lez / Notayek / Celebek nebat. 9- Navê mîra / Seydayê dîni / Li Tirkîye navê ajansek xebera. 10- Rih / Di pirtûka hozanê mezin Ehmedê Xanî de dilgirtiya Mem. 11- Yê yekemîn / Hejmerek / Menzel. 12- Navê hozanek Kurd, di wênede tê dîtin.

### SEREJÊR:

1- Merkez / Yek bûyîna jiyana xort û keçekî. 2- Eşq / Navê birayê Fidel Castro / Notayek. 3- Navê çiçekek / Sembola Îrîdîfûm. 4- Avahiyên Se-



wal (heywan) an / Di felsefê de Raman, fikr. 5-Celebek Çapemeniyê / Di pirtûka hozanê mezin Ehmedê Xanî de dilgirtiya Zîn / Nexweşînek ku di laşê mirov de zêdayî Çêdi. 6- Zayîn, yêkû zaye / Zehmet / Di notayê de dema seknê. 7- Da, dayê / Tiştên Şewitandinê / Cinavka kesane duymîn pirhejmar. 8- Mane / Zû. 9-

Lêkolîngerê bingehên peyva / Atomên elektron barkirî. 10- Di matematîkê de navê hejmarek navdêr / Dinya / Li Ewropaya navê çiyayek. 11- Navê heykel û wêneyên dêran / Mezinê eşîrê / Baneşanek bankirinê. 12- Perê Japonan. 13- Din, mezheb. 14- Rengekî. 15- Bilindayî. 16- Sûka elafan.

### BERSÎVEN XAÇEPIRSA HEFTEYA ÇUYÎ

ÇEPEAST: 1- Helepçe / Azerbaycan. 2- Adar / Îkebana / Xort / Do. 3- Veşartok / Re / Lam / Ober. 4- Ît / Sê / Nota / Ea / Errewî. 5- He / Ho / Êvar / Ref / Rî. 6- Se / Xemilandin / Sedef. 7- Berzanî / Gî / Ana / Ête. 8- Awerte / Ertoşî / Anal. 9- Pak / Hikona / Deve / Îra. 10- Îlon / Safran / Tn. 11- Lorî / Benî. 12- Rextegûr / Riş. 13- Îrem / Au / Of / Beka. 14- Lain / Br / Reb. 15- Celdeka / Celeb. 16- Dem / Eta / Paşa / Ra.

SEREJÊR: 1- Havîn / Bapîr / Îş. 2- Edet / Sewal / Ar / Ce. 3- Laş / Herekol / Elem. 4- Erase / Zr / Normal. 5- Re / Xatî / Re / Îde. 6- Çit / Henek / Îxanet. 7- Ekonomî / Os / Nû / Ka. 8- Eko / Enaze / Ba. 9- Ab / Têlgraf / Gor. 10- Zarava / Raif / Ca. 11- Ene / Angola / Reş. 12- Ra / Erdîş / Nb / Bela. 13- La / Îd / Erebe. 14- Axa / Rna / Etnîk / Br. 15- Yom / Navnîşan. 16- Cr / Efsane. 17- Atom. 18- Berdêlî. 19- Dewlet. 20- Gorî / Feza.



## NEQUŞK

Amadekar  
Aram Çem

Em ewqasî hez ji jiyane dîkin ku bêdudilî di riya wê de em dikarin serê xwe deynin.

Mazlum Doğan

## Necmettin Cevheri û şertê wezîrtiyê

Mamoste û mirovhezê mezin İsmail Beşikçi di kitêbên xwe de dibêje ku Kurd dikarin bibin hertişt bi şertê ku eslê xwe înkâr bikin.

Ev ji sedî sed rast e.

Roja 14 ê mehê Rojnamevanê rojname Milliyetê, piştî ku Necmettin Cevheri ji nav Kurdan vedigere, wî û çend wezîrên din dibîne û ji wan hejmarek pirs dike. Binerin bê Wezîrê Gundan û Çandiniyê (Tarm ve Köy İşleri Bakanı) Necmettin Cevheri çî dibêje: "Me ji Wezîrê Gundan û Çandiniyê Necmettin Cevherî pirsî we bi Kurdî yan bi tirkî bi xelkê re xeber da?"

Em bi kurdî jî zanin, ev ne muhîm e. Min heşkere û vekîrî ji xelkê re got. Binerin ez jî ji nav we derketime, hûn dibînin ez bûme Wezîr. Ez careke din jî bûm Wezîr. Dewletê ez carekê jî kirim Wezîrê Dadmendiyê (Adalet Bakanı). Ma ev hindik e? Min ji wan re got, Hikmet Çetin jî ji we ye, ew niha bûye Wezîrê Karên Derve (Dışişleri Bakanı). Ev bi destê herkesî nakeve."

"Xelkê ne digot çî?"

"Hema digot tu rest dibêjê ezbenî. Bi rastî min rewşa herême (meqsed welat e) baş dît, ez li nexweşiyêke ciddî rast nehatim, kes naxwaze ji

Tirkîyê cihê bibe. Ma ev wê çawa bibe. Va ye Ehmed jî li pêşberê min e paşnavê wî jî Tirk e" (Ji bo Ahmet Türk dibêje).

Rojnamevan Yavuz Donat didomîne "Necmettin Cevheriyê Kurd li cihên ku geriyaye ji Kurdan re dibêje:

"Gelî merivan bi aqil bin. Tenê ev herêma ya me be baş e, yan ku İstebol jî ya me be. Ma ku Edirne, Kırklareli, Baeski, Antalya, Bodrum, İzmir û Bursa jî yên me bin ma ne baştir e. Ji Tirkîyê veqetî nabe; we aqilê xwe bi nan û penêr nexwariye. bi baweriya min tiştêkî ku mirov jê hesabî bike û bitirse tune ye"

"Ev bûn peyvên dawî yên Cevherî ji bo mirovên ku ew ji nav wan hatiye di nav wan de mezinbûye û av û nanê wan vexwariye"

Necmettin Cevheri bi giş gotinên xwe tiştê ku Dr. İsmail Beşikçi dibêje qebûl dike. Ji ber vê rastiye û vê itîrafê kes Wezîrê Çandiniyê Cevherî nagre û navêje binê zîndanê. Belê Beşikçi ji ruwê vê rastiye bi dehan car heta niha ketiye hebsê.

## Nanê me dixwe li ber deriyê yekî din direwtê

Segê (kûçikî) merivekî xwedî terş heye. Li mala xwediyê xwe nan dixwe û li ber deriyê yekî din diwê. Rojekê xwediyê pez li ber hevşoyê xwe razaye. Lê çî bike xew û mirin birên hev in, gur ketiye nav pez, çendek jê kuştine û çûye.

Dema meriv serê sibehê pezê xwe ji hevşo derdixe dibîne ku gur ketiye nav pezê wî û çendik ji wan kuştine. Xwediyê pez tê mal û şo dike segê xwe, seg tê û dâvikê xwe li ba dike. Xwedî çiftê digre û bera serê seg dide û wî geber dike. Cîranê wî jê dipirse, ma cîran ji bo çî te ev segê ha kuşt. Xwedî cewabê didiyê: Segê ku nanê merivan bixwe û li pez xwedî demekê heqê wî kuştine.

Hin kesên me jî ku Kurd in, bi nan û ava me mezin bûne û îro bûne xwedî mesûliyet û li ber deriyê xelkê direwtin hene. Ma çî ferqa wan ji wî segî heye?

Ş. Zimag

## TÎR

Musa Anter



## Weqfa Vehbi Koç

Meşhûr sêkaxetçî Vehbi Koç weqfek vekiriye. Hûn zanin bê weqfa wî ji bo çî ye? Ji bo ku zarok çênebin û hîn di zikê diya xwe de bin wan bikujin. Pirseke me ya pêşyan heye. Dibên xwedê du tiştan bi hev re nade însanan. Ku yekê didyê, yekê jê distîne. Ez dinerim ev pirs ji bo Vehbi Koç hatiye gotin. Xwedê mal dayê, lê dîn, îman û wîjdan jê stendiye. Tirsê Vehbi Koç ji bo Pîrbûna zarokan e. Dibê ev buhaya niha li Tirkîyê heye hemû sûcê zarokan e. Hey tu û zuriyeta xwe hemî bi qurbanî serê zarokêkî bûno. Çima tu nabê ev bihayî ji wan tenekên ku ez ditewînim dikim teqî, bûzdolabî, mekînen çekan û êdin ku kengî qîma min bixwaze ez zembîlek pere li heqê wan zêde dikim. Bê însaf. Lîngêkî te li der e û yek li gorê ye û elhemdullah tu nexweşê şekerî tu nîkarî xwarina me bixwî. Tu îsal sih sal kerş merşê tewş dixwe. Çî heqê te li van zarokên wek berxikan heye ku tu dibê hîn di zikê diya xwe de ne wan bikujin?

Bine Vehbi Koç di temamê dînan de lanet li tibêtê te hatiye. Hezretê İsa di incîla Lûka de ayeta 36 an de wiha dibêje: "Yekî dewlemend ku bi rûkî sipî karibe here hizûra xwedê zortir e ku mirov devê di qula derziyê re der bas bike". Li vir İsa heqê te da te, em bîn ser Hezretê Muhamed. Di qurana şerîf de xwedê dibê: "Zarokên xwe mekujin, ezê rizqê wan bi wan dim". Di Tewratê de jî xwedê ji Adem û Hewa re dibê: "Bi bereket bin, zarokan çêkin, rûwê dinyayê tijî bikin".

De îca yabo layê beqalekî Vehbi Koç İsa, Mihemed, Mûsa û Xwedê li wî alî dihêle û ji xelkê re dibêje: "Gidî zarokan çê mekin."

Tirte firta Vehbi Koç ne vala ye. Sebebên wê hene.

Ew jî dijminêkî Kurdan e. Belkî hinek jî pîf dikinê dibên Kurd gelek zarokan çêdikin û Tirk çênakin, wê wextek bê Kurd pir bibin û serdestiyê li Tirkan bikin wê çaxê jî wê ji Vehbi Koç re lawkê beriyê bêjin.

Weqfa Vehbi Koç bi milyaran hebên ku pîrek pê bi hemil nebin, belaş şandin Kurdistanê. Lê mezinên Kurdan jî li Kurdan tembîh kir go gidî van heban mexwin lawo, bi wan heban hûn dê êgir berdî mala me û hunê bizrê me biqelînin û ji alîkî de jî wê pîrekên me giş bibin qanser. Ew hebên ku dan jî hormon bûn xwedê zanê hinekan ji Kurdan re got lawo van heban bixin bin dar û berên xwe yên fêkî wê fêkiyê wan qenc çêbibe. Wiha kirin. Ji alîkî jî cardî weqfa Koç Efendî bi milyonan qapût şandin Kurdistanê ku zîlam têxin sitrên xwe, bizrê wan nekeve nava pîrekên wan. Ew jî cardî hinkan gihandin xortên Kurdan, go lawo ev balon in bidin zarokên xwe bila binepixinin û ji xwe re bi wan bilîzin. Ew jî wiha kirin, zarokan pîfkin wan û bi aliyê ruwê Vehbi Koç de avêtin.

Ez niha dinerim tu dibê qey derdekî Tirkîyê nemaye ji zarokên Kurdan pêve. Rihê wan dire. Heta wê rojê rojnameyekê nivîsibû li ser zîmanê Apo, dibê Apo gotiye: "Xortên Kurdan ya derkevin çiyê û yan jî herin pîrekên xwe û zarokan çêkin." Ez nizanîm. Apo wiha gotiye an negotiye, ma min çî ji Apo ye, Apo ne Apê min e, ku tu bajo belkî ez kalkê wî bim, lê ku gotibê xebra wî ye, okey.

## Teyrên dubirak

Van rojan serokcumhurê kevin û pêşengê 12 ê flone General Kenan Evren bîranînên xwe di rojnameya Milliyetê de diweşîne.

Bîranînên Evren Paşa bûye sebebên hin dilmanî û gazinan. Bi taybetî Serokcumhurê niha Turgut Özal bêhna xwe zefh teng kiriye û ji bo bîranînên Evren dibêje:

"Ev ne bîranîn in, vî mirovî salên xwe bi xeybet û sebebê derbas kirine, ji xeybet, seb û paşgotîniyan pêve di van bîranînên de tiştêk nîne."

Di kitêbeke nuh de ku taze derketiye û nivîskarê wê rojnameyê nivîsarekî navdar bi navê Abdullah Özkan e ji bo Evren û Özal çêlikên Apê Sam hatiye gotin. Her wiha di vê kitêbê de raporeke CIA ji sala 1983 an heye ku tê de ev cumle jî derbas dibe: "Kenan Evren û Turgut Özal mîna du teyrên dubirak in, wek du heval cewiyan in û zehf bi hev dikevin."

Çêlikên Apê Sam doh jî û îro jî çêlikên apê xwe ne û kes baweriyê bi wan nayîne.



Jiyan dewlemend e, jiyana civakî pîralî ye. Birçî yan tîr, xweş yan nexweş jiyan nasekine, bi riya xwe de dimeşe û berdewame. Jiyan bi rûmet û ya bê rûmet heye. Jiyanêke azad û serbest mafê her gelî ye...



# Newroz û pêşeroj

Derbasiya mirovahiye ya ji dema hovîtiye ber bi bajarvaniye ve, şoreşeke mezin e. Ev tiştekî wisa ye ku, di her warê jiyane de hatiye xwiyar. Ji bo ku mirov bikaribe dakeve nav serpêhatiyên dînamîkên Newrozê, berî her tiştî, divê ku mirov, ji vê dema dîrokê ve dest pê bike. Ji lewre bi şoreşa neolotîkî, giraniya cotyarî û çandiniyê di jiyana civatê de derdikeve holê. Ev jî cara yekemîn e ku giraniya ezmanasî (astrolojî)ye, di nav van civatan de tê xwiyar. Û gelên hemdem jî, demsal û salnameyan li gor vê amade dikin.

Bi vê şeweyê, di demên kevnare de cejnên sala nuh, an di navbêra havîn û zivistanê (21 ê Hezîran ê û 21 ê Kanûnê) de, an jî di navbêra bihar û havînê (21 ê Adarê û 21 ê Îlonê) de dihat pîroz kirin. Newroz jî, di destpêka biharê de dihat pîroz kirin.

Ji ber vê, mirov dikare bibêje ku Newroz Cejna sersala nuh e.

Bê guman mirovan, cejnên xwe yê sala nuh hewqas hêsan û xwerû ne afirandin. Helbet senaryoyeke mîtolojîkî ya sala nuh heye. Li gor vê, roj an jî yezdanê rojê, bi ejderhayê re dikeve şer û wî dîkuje. Roja ku Roj ejderha dîkuje, ew roj jî dibe serê sala nuh. Lewre, wisa dihat zanîn ku demsala baranê an jî bihar bi tevgera kombîne ya navbera tavê û rîya kadîz ve girêdayî bû. Dema ejderha ewran û avê direvand û heps dîkir, li ber yezdanê rojê têkdîçû; av jî azad dima di dawî de jî, demsala baranê dest pêdîkir.

Li her derê dinyayê, sala nuh, bi yek senaryoyê ve dihat girêdan. Nimûnek: Roja ku yezdanê Babiliyan Marduk, Tîamatê ejderha dîkuje, ev roj wek cejna sersala nuh, ji aliyê Babiliyan ve tê pîroz kirin. Navê vê cejnê jî Akîtu ye û di 21 ê Adarê de dihat pîroz kirin. Hîftîyan jî cejna xwe ya sala nuh Purulliyasê, di 21 ê Adarê de pîroz dîkirin. Li Misrê ya kevnare, roja ku yezdanê rojê Ran, mar Apofîsê dîkuje, ev roj jî wek sersala nuh tê hesibandin. Dîsa yezdanê (xwedanê) Hindiyên Indra, ejderha Virtra dîkuje, ev roj jî wek sersala nuh tê zanîn.

Cejna Japonîyan ya ku binavê Shunkî Koreî Saf tê navdan di 21 ê Adarê de tê pîroz kirin. Ji ber vê em dibêjin ku wateya (mana) Newrozê ya orjîmî di nav vê senaryoyê de veşartî ye. Ji lewre Newroz, di pirtûka Zerdeştîyan a olî (dî-nî) Aweste de, bi wî şerî ve ku di navbêra Thraetaonna û ejderha Azhî Dehaq de derbas dibû, dihat girêdan. Di Awesteyê de em, rêberê mîtolojîkî yê Kurdan Kawa nabînin. Kawa, bi serpêhatiyê ve an jî bi destanê ve, dawîn hatiye pêve

kirin. Bi bajarvaniyê re, hevberiya hovîti û şarezaiyê, şerê navbera gelên hemdem û dijîtiya çîmî, yê ku di Awesta de navê wî yezdan Thraetaon derbas dibe, di mîtolojiyê de dibe qiralê Babîl ê zordest Dehaq. Dehaq, her roj serê du xortan dide jê kirin û

● **Belê niha, nebza Kurdan, di Newrozê de, nebza Newrozê jî, di Kurdan de dihavêje; yê ku vê nebîne nîne. Ez di 21 ê Adarê de, dînamîzm û şahiyê dibînim. 21 sal, ciwaniya xortahiyê û dînamîzma wê dide nîşan. 21 ê Adarê, şirovekirina biharê ya nuh hatiye; bi kurtayî dînamîzma xwezahiyê (tabîet) îfade dike**

mejiyên wan dide marên ku li ser milên wî derketine. Ev serpêhatî jî, bi jêdera xwe ve Hindî ye. Li vir em, nêçirva-

539) hatiye bidest xistin. Imperatoriya Dehaq ku bi navê Babîla nuh dihat zanîn, hilweşiya û Kûraş jî, di mîtolojiyê

niya serjêkirinê jî dibînin.

Babîl, ku wek welatê Dehaq tê zanîn, di bin rêberiya qralê Farisan Kûraş de, ji hêla Gutiyan ve, berî zayinê (bz.

539) hatiye bidest xistin. Imperatoriya Dehaq ku bi navê Babîla nuh dihat zanîn, hilweşiya û Kûraş jî, di mîtolojiyê

de, bi navê Kawa derbas dibe. Hesinkerîya Kawa jî, bi timî mîtolojîkî ye. Weke Nommosê Malî, Govannonê Keldîyan, Waylandê Germenîyan, Hephastosê Grekan, Volkanê Romayîyan û Kurdalagonê Osetan lehengên (qehreman) hesinker ên mîtolojîkî dihatin zanin.

Van yezdanan çekên birûskê çekirine û wisa dihat bawer kirin ku birûsk jî ji hesin çêbûye, ji ber vê yekê navê hesinkerîyê li wan hatiye danin. Lê belê Kawayê hesinker, ji aliyê gel ve, wek hesinkerên din ne dihat zanîn; taybetiyên wî yê welatparêzî û çîmî jî hebûn. Sedemên wî jî, ji giraniya jiyana gelê Kurd ya civakî û konevanî (siyasî) derdikeve. Gelê Gutî (Kurd) wisa dixwiyê ku rîsteke (roleke) wiha mezin daye Kuruş.

Kuruş, bi mîtolojîkî çawa bû hesinker? Baweriya min ev e ku Kuruş dema bi Gutiyan Babîlê bi dest dixin û Dehaq jî dikujin, yezdanê bahoz û baranê ku çekê, wî jî hêsinî ye alîkariya Kuruş dike. Ji ber vê yekê navekî din ê Kuruş Kawa Huçrawa an jî Keyhusrev e. Bi vê şeweyê Kuruş, bi navê Kawa yê hesinker derbasî mîtolojiyê bûye.

Divê ku em pariyek jî, di derbarê (derheqê) vê dema nuh de çend peyvan (kelime) bibêjin. Newroz, îro ji hêla kesên an saziyên fermî (resmî) ve cejneke bi hov û bi tîrs tê zanîn. Ji ber vê yekê ew naxwazin û nahêlin ku cejna Newrozê bê pîroz kirin. Di vê dawiyê de jî dixwazin ku li gor qîm û xwesteka wan bê pîroz kirin. Lê di vê babetê de jî bi ser neketin û bi ser nakevin. Dixwazin ku Newrozê, bi destana Ergenekonê re bixin yek û wisa bidin nasandin. Lê ev yek jî, bê derfet (imkan) e.

Li gor Kurdan Newroz, hîna dînamîkên xwe yê mîtolojîkî diparêze. Her çiqas çapemeniya burjuvazî, dixwaze ku Newrozê wek "Serhildana Adarê" bidin nîşandan û dewlet jî, bi hemû hêzên xwe ve êrîş bike ser Newroza 92 wan ku agirê Newrozê bivemirînin, çî ji destê wan tê dîkin. Lê disa jî nikarin rastiye ji holê rakin.

Belê niha, nebza Kurdan, di Newrozê de, nebza Newrozê jî, di Kurdan de dihavêje; yê ku vê nebîne nîne. Ez di 21 ê Adarê de, dînamîzm û şahiyê dibînim. 21 sal, ciwaniya xortahiyê û dînamîzma wê dide nîşan. 21 ê Adarê, şirovekirina biharê ya nuh tîne; bi kurtayî dînamîzma xwezahiyê (tabîet) îfade dike. Li gor baweriya min, sedsala 21 î wê bihara sosyalîzmê bîne; sedsala 21 î wê bibe xortîniya sosyalîzmê. Ez di vir de jî giringiya 21 ê Adaran dibînim.





Di demeke nêzîk de wê kovareke nuh derkeve. Kovar ya pêkenok û qerfa ne Navê Kovarê Tewlo ye. Ji bo vê kovarê hejmarek xortên jîr û germ, Kurd û Tirk destên xwe dane hev û wê kovara Tewlo bi du zimanan, bi kurdî û tirkî biweşînin. Navên wan ev in: Seyfî Şahin, Doğan Güzel, Ahmet Keskin, Mumin Durmaz, Zeynep Durusu, İltar Çitak, Ceren İncesu, Can Baytak, Xelil Ziravav, Tarık Tolunay, Bülent Morgok, Cahit Çelikel, Sefer Selvi, Gurhan Doğan û Adnan Sancar.

Di nava nivîskarên wan de navê Mûsa Anter, İsmail Beşikçi û Luis Garcia derbes dibin.

Me xwest em armanc û hedefên kovara Tewlo ji bo xwendevanên Welat bidin nasandin û ji bo vê jî bi xebatkarên Tewlo re hevpeyvînek çêkir. Doğan Güzel, Tarık Tolunay û Xelil Ziravav bersivên me bi awayê jêrîn dan.

Me pirsî:

Çima Tewlo?

— Rewşa îro mudaxelê dixwaze, em ji zûde li ser kovareke pêkenokan difikirin. Vê fikrê her yek ji me ev demeke dida ponijandin. Nebûna kovarek wilo me wek kêmasiyekê didît. Em tev gihan hev, me şewra xwe kir yek û ji bo Tewlo em ketin kar. Li sûk û piyasê bi dehan kovarên qerf û pêkenokan hene. Giş dahulvan û zurnevanên rejîma li ser kar in, ji sistemê re li çepikan dixin. Yên ku li dijî sistem û rejîma li ser kar derkevin tune ne. Em li hember vê sistemê wek alternatîveke kovarên qerf û henekan derdikevin.

Pêkenok çi ne, di jiyana civakî de çi wezin û giraniya wan heye?

— Em li pêkenokan wek zimên dinerin, zimanekî pêkenokan heye. Pêkenok jî mîna zimên, muzîkê û sînemayê di jiyana civakî de roleke mezin dilîze û tiliya xwe datîne ser pirsigirêkên civatê. Li ailyê din pêkenok hunera



derdikeve

gel bi xwe re hildigrin, şeweyekî taybetî û xweser e, ji bo mirov li ba gel cihê xwe bigre û bi gel re be, gel bi tenê nehêle.

Çanda kurdî ji aliyê qerf û henekan û ji aliyê pêkenokan ve pîrr dewlemend e, li ser pêkenokên kurdî û pêkenokan bi giştî we çî lêkolîn çêkirine?

— Em nikarin bêjin ku me lêkolînek baş kiriyê, ji ber ku ev gava yekemîn e, bi kêmanî em wilo dizanin. Em piştî xwe nadin mîraseke xwîrt û çavkaniyê ku em jê istifade bikin bi nivîsandin nexwiyayê. Em bahwerin ku em û xwendevanên xwe bi hev re em dê bigihin armanca xwe. Em dê bialîkariya karîkaturan, xezromanana û metelokan û rexneyên xwe di Tewlo de li henber rejîmê cebheyekî nuh yê xebatê vekin û em jî dê bi vî awahî têkevin nav rêzên

gel. Li aliyê din em ê ji kes û mirovên Kurd yê xwedî tecrûbe ku wêje û dîroka Kurdan baş naskidîkin alîkariyê bixwazin û em bawer in ku alîkarvanên me pîrr bin.

Çima kurdî û tirkî?

— Ji ber ku ev kovar xîtabê herdu gelan jî dike. Ji ber vê yekê herdu ziman jî divên. Kovar ji bo têkoşîna herdu gelan jî wê bibe alîkar

Tirk xwîrt bike û wan li hev nêzîktir bike.

Gelê Kurd gerek hînf xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe bibe. Em hevîdarin ku Tewlo li vir alîkariyê heja bike.

Siyaseta kovarê wê çibe?

— Kovara Tewlo, Kovareke şoreşger û welatparêz e. Lê em ji hev cihêbûnê naxwazin, em hevalên yekîtiyê ne. Em li ba têkoşîna gelên Kurd û Tirk in. Em ji xebata ji bo lihevneziqbunê herdu gelan xwe çî carî nadin paş û di vî babetê de xwedî helwest û siyaseteke zelal in. em ne birayetiya birayê biçûk û mezin belê em hevaltiya gelan dixwazin. Ji ber ku birayê mezin yê biçûk dişîne dikanê. Ev nabe; divê çûna dikanê bi dorê be.

Hûn dê rûpelên xwe çawa dagrin, ango wê naveroka kovarê çawa bête beşkirin?

— Me rûpelê duhemîn ji bo xwendevanana veqetand. Pênc pelên mayî jî wê ji bo xêzromanana bêne terxan kirin.

Wê hinek ji wan demeke dirêj dom bikin. Me du rûpel jî ji bo rojev û siyasetê cihê kirine. Nivê van rûpelan jî jî ye. Rûpelek jî pişka jinan e. Ev rûpel wê serbixwe be. Li aliyê din di nav rûpelan de wê fiqre û karîkatur cih bigrin. Ji bo rûpelê dawî jî heger em bi peyveke latîfî bi nav bikin, em dikarin bêjin rûpelê îlîsturasyonê. Di vî rûpelê de wê afîş, wêne û êdîn cih bigrin. Her wiha di vî rûpelê de hêzên ku rojevê bînin ziman jî wê hebin.

Wekî din wê di kovarê de tevger û serhildanên Kurdan, çîrok û efsanên Kurdan bi awayê xêzromanana dê bêne neqîşandin û dariştin. Di kovarê de romaneke Luis Garcia jî bi xêzan wê cih bigre. Ev roman li ser jiyana çermesorîk (Kızılderili) ên Emerîka, serpêhatiya wan û çîroka wan e. Em bawer in ku jiyana çermesorîkan ji ya me ne pîrr dîr e û neheqîya ku li wan û li me hatiye pîr dişib in hev. Em bawer in wê gelên me vî xêzromanana pîr nêzîkî xwe bibînin, Xêzromanana wê xwerû bi kurdî be.

Hûn dawî çî dixwazin bêjin?

— Dibe ku hin kes bêjin yabo evqas bele û tifaq hatiye serê me, derd û kulên me nebes.bûn, îca ev Tewlo ji me re ji ku derket. Bila bêhna xqwe fireh bikin, bisekinin heta ku em derkevin. Em bawer in çend hejmarên Tewlo derkevin, bigihin destên xwendevanana û xwendevanana tama Tewlo binasin wê fikira xwe biguherînin û wê li acizîya xwe poşman bibin. Wê bi demê re xwendevan jî qebûl bikin ku Pêkenok jî karekî cidî ye. Daxwaza me ji xwendevanana ewe ku ji cihê xwe, li bajar û gundên dimînin ji me re wêne, karîkaturan û metelokan kom bikin û bişînin. Em gotina dawî-piştî me xwe hinekî da naskirin êdî ji xwendevanana re dihêlin. Gotina dawî ne ya me, belê ya wan e.

Hevpeyvîn: Nijad Yaruk



TISTEK KETIYE ÇAVÊ MÎN PIRDESE KA BINÊKÎN EV ÇI YE?





Nivîskar Mehmed Uzun:

# "Kurdayetiya ronakbîrên me qels e"


Berî her tiştî em dixwazin hûn xwe ji xwendevanên re bidin naskirin. Kî ye Mehmed Uzun?

— Berî her tiştî, ez dixwazim we bi vê gava tarîxî pîroz bikim. Ev gav li ber dilê min pir ezîz e û derketina rojnameya Welat bûyereke tarîxî ye. Ez ji bajarê Siwêregê, 1953, me. Zaroktiya min li wir bihurî. Min dibistana yekemîn, navîn û lîsê li wir xwend. Paşê, min li Enqerê, li Yûksek Teknik Öğretmen Okulu'ye dest bi xwendinê kir. Sala 1972 an, ez hê 19 salî bûm, hatim girtin û bi qasî du salan li girtgehên eskerî yê Diyarbekir û Enqerê mam. Di sala 1976'an, de roja Newrozê, min û hin ronakbîrên din ên Kurd, me bi hev re dest bi weşandina kovara Rîzgarî kir. Ez berrisîyarê kovarê bûm. Ji ber vê yekê, ez hatim girtin û bi qasî 8 mehyan li girtgeha Enqerê mam... Bi dû berdana min re, min dev ji Turkiyê berda û derketim derveyî welêt, 1977. Ji wê rojê û vir ve ye, ez li derveyî welêt, Swêdê, dijîm. Ev yekemîn car e ku ez, piştî 15 salan, li Turkiyê me.

Li derveyî welêt, min nivîskarî û rojnamevanî kiriye. Heta niha min çar(4) roman, bi zimanê kurdî, nivîsîne. Min çar kovar û rojnameyên kurdî îdare kirine. Min li rojname û kovarên Swêdî nivîsîne. Ez endamê Yekitiya Nivîskarên Swêdî, Pen-Klûba Swêdî, Yekitiya Rojnamevanên Swêdî û Yekitiya Rojnamevanên Cîhanê me. Di van rêxistinên edebî û çandî de, ez bi aktivî dixebitim.

**Zimanê kurdî ev 70 sal in qedexe bû. Gel ji xwendin û nivîsandinê kurdî dûrketiye. Îro kurdî serbest e. Lê çand û zimanê kurdî derbên xedar standine. Pirsê zimanê de çawa bê çareserkerin?**

— Rewşa zimanê kurdî, îro, ne ew rewş e ku meriv bikaribe pê qayil be. Zimanê me perçiqiye, peritiye, qurmiçiye, ji avahî û dewlemendiyên xwe hatiye miçiqandin. Sebebên vê yekê diyar in. Îro, li ser sebebên peyivîna edî ne hûnerê mezin e. Hûnera mezin îro ew e ku em bikaribin bi zimanê kurdî binivîsin û bixwînin. Ez di wê baweriyê de me ku eger em bi kurdî bixwînin û binivîsin, zimanê me dê, di demeke kin de xwe bigihîne katên gelek bilind. Zimanê kurdî xurt û dewlemend e. Eger ew ne zêdeyî zimanên cîran be, ne kêmi wan e. Bi tenê em bikaribin û hewl bidin ku bi zimanê kurdî bixwînin û binivîsin. Bingeh û hîmên esasî yê zimanê nivîskî yê kurdî temam in. Gramera kurdî heye. Qayidên nivîsîn û xwendina kurdî hene. Celadet Alî Bedirxanê gorbehişt ev hemû, bi xebateke bêhempa, ava kirine. Lê, hin kêmanî û qelsiyên zimanê nivîskî hene. Ev jî dê bi xwendin û nivîsînê, hêdî



hêdî, ji holê rabin. Em divê gelek bala xwe bidinê ku zimanê kurdî bikin zimanê perwerî û xwendinê. Em divê kar û xebatên xwe yê civakî, siyasî, çandî, edebî û ronakbîrî bi kurdî bi rêxînin. Herkesê ku dikare bi kurdî binivîse, divê dest pê bike û binivîse. Di vî warî de, Kurd divê kampanya veki û pir bixebitin.

Ez hebûna devok û zaravayên kurdî ne mîna kêmanî û qelsiyê zimanê kurdî dibînim. Ji ber vî yekê, ew dewlemendiyên zimanê me ne. Em divê alîkarî lê bikin û teşwîk bikin ku bi devok û zaravayên kurdî bête nivîsin. Herçiqas bi wan were nivîsin, zimanê kurdî dê ewçend dewlemend û biber be.

Herçî kêmanî û problemên zimanê nivîskî ne, jê re civîn û konferansên ilmî û akademîk divên. Di vî warî de, li derveyî welêt gelek tiştên baş çêbûne. Em divê wan tecrûban veguhêzînin welêt û li welêt xebata ilmî ya li ser zimanê geş bikin. Ne bi lez û bez, lê bi plan û program. Bi hev re, bi hevkarîyê têkûz. Ji ber ku ziman, zimanê me hemûyan e. Pêşketina zimanê, pêşketina me hemûyan û welatê me ye.

**Ronakbîrê Kurd çawa tê nasîn, hûn çawa tarif dikin?**

—Gelo ronakbîrê Kurd kî ye? Bersivên vê pirsê texlît bi texlît in. Em dikarin gelek analîz û lêkolînan li serê bikin. Lê li gora min, bi kurdî, ronakbîrê Kurd ew kes e ku bi awayekî di nav tevgera welêt de ye û li hember ziman, çand, civat û welatê xwe xwediyê berrisîyariyên exleqî ye. Berrisîyariyên exleqî pir girîng in. Gava rewşa zimanê min ê bav û kalan ewçend kambax be, ez ê çawan jê rû badim û bi zimanekî din binivîsim? Ez ê çawan beşdarî li avakirina edebiyata modern a kurdî nekim. Çawan ez ê xwe ji avakirina tevgera ronakbîrî, felsefî, çandî û edebî ya millî bidim alî?... Li gora kîjan prensîbên exleqî ez ê van yekan bikim?..

Em dizanin; xwende û ronakbîr ne eynî tişt in. Ronakbîr ew kes e ku bîr bi ronahiyê dibe û ji bo ronahiyê dixebite. Ronakbîrê Kurd divê bîr bi ronahiya welêt bibe û li gora quweta xwe, di warê xwe de, bixebite û bafîrî-

● "Em herkes bi serê xwe nikarin rabin li gora daxwaza dilê xwe û li gora rewşa devoka xwe qayide û prensîban ava bikin. Bi ya min, ev şaşiyê mezin e. Hedef û armanca me divê ew be ku em zimanê nivîskî standardîze bikin, devok û zaravayan nêzî hev bikin. Eger em rabin bi serê xwe qeyidene nû bînin pê, hingê em ê bibin sebebê serêşî, teşqe û geremolên nû. Çima?"

ne. Afirandin pir girîng e. Di warê afirînê de em ne xurt in. Em divê vî aliyê xwe xurt û têkûz bikin.

Kêmaniyên me û ronakbîrên me pir in. Ronakbîrên me yê ku di medresan de perwerde bûne, gelek bala xwe didin ser ziman, çand, edebiyat û tarîxa kurdî. Bi sedsalan e ku bi xêra van ronakbîran ziman, çand û edebiyata me hatiye parastin. Lê dinya van ronakbîrên me pir teng e.

Heya wan zêde ji cîhanê û tevgerên cîhanê nîn e. Xebatên wan zêde ne ilmî û bi metodên ilmî ne. Pêwendiya wan û pêşketina medeniyetê nîn e, eger hebe jî, ew pir qels e... Li milê din, ronakbîrên me yê ku di xwendegê û unîwersîtan de perwerde bûne, gelek bala xwe didin ser îdeolojiyan, pêşketina tevgerên siyasî, felsefî û çandî yê cîhanê. Pencera wan a ku li cîhanê vedibe, fireh e. Lê belê, bala wan ne li ser hebûnê me yê bingehîn, ziman, çand, edebiyat û tarîxa kurdî ye. Heya wan jê yan hîç nîn e, yan jî pir kême. Ji bo xwendin û nivîsina kurdî xwe zêde naêşînin. Vê yekê mîna mesela xîret û şerefê nabînin. Ew edebiyata me ya klasîk nizanin û nas nakin. Huwiyeta wan a neteweyî ne xurt e... Yanê naveroka kurdayetiya wan qels e.

Em divê van kêmaniyên xwe ji holê rakin. Me ronakbîrên millî, lê di eynî wextê de navneteweyî divên. Em divê reh û rêçên xwe baş bizanibin, lê di eynî wextê de pêwendiyên me yê cîhanê xurt bin; hem klasîk, hem nûjen bin û bikê û biber bin.

**Hûn di romanên xwe de kîjan rastnivîsê pêktînin?**

— Ez di romanên xwe de, di nivîskariya xwe ya kurdî de qayideyên Hawarê bi kar înim. Bi rêberiya Mîr Celadet Bedirxan, kovara Hawarê hê di salên 1930 an de qayide û prensîbên nivîsina kurdî, bi tipên latînî, anîne pê. Eger kêmaniyên wan hebî jî qusûrên wan nîn in. Em herkes bi serê xwe nikarin rabin li gora daxwaza dilê xwe û li gora rewşa devoka xwe qayide û prensîban ava bikin. Bi ya min, ev şaşiyê mezin e. Hedef û armanca me divê ew be

ku em zimanê nivîskî standardîze bikin, devok û zaravayan nêzî hev bikin. Eger em rabin bi serê xwe qeyidene nû bînin pê, hingê em ê bibin sebebê serêşî, teşqe û geremolên nû. Çima?

**Ev 10-15 sale hûn ji welêt dûr in. Hûn nuh vegeerî welêt. Di nav van 10-15 salan de gelek tişt hatin guhertin. Rewşa welêt çawa ye? Hûn karin bînin zimên?**

— Welatê ku min di sala 1977 an de li pey xwe hîştibû û yê îro ji hev pir cîhê ne. Îro pêla şûra millî, bêpayan, bilind e. Kurdayetî ji hebata kesên û komên biçûk derketiye, bûye neteweyî û girseyî. Bi alîkarî û rêberiya rojname û kovarên mîna we, zimanê kurdî jî nû ve vedije. Weşanxanên kurdî ava bûne û gelek berhem, bi kurdî û tirkî, diweşînin. Rojnameya Welat xwerû bi kurdî, her hefte, diweşe. Tevergera neteweyî, pêla şexsiyet û huwiyeta kurdî, kat bi kat, bilind dibe... Ev hemû gavên tarîxî ne.

Ev hemû, berhemên xebata 70 salan a bixwîn û xwîdan in. Bi sedan û hezaran şexsiyet û şehîdên welatê me bi hêviya van rojan, çavvekirî çûn diyarê rehmetê. Keda wan di berhem û eserên îro de pir e.

Lê em divê tiştêkî ji bîr nekin; bi qasî ku ez dibînim, xelkî û birçiyê zanîn, îlim, felsefe, ziman, çand û edebiyatê ye. Ev pêla neteweyî divê bi van were dagirtin, neqîşandin. Zanîn, îlim û xebatên ilmî mîna nan û avê, ji bo me pêwîst in.

Ez bi dîtina vê pêşketinê pir mesûd û bextiyar bûm.

**Li welatê me demeke nuh destpêkiriye. Çine faqtorên vê dema nuh?**

— Rast e, bi qasî ku ez jî dibînim, li welêt dem û heyameke nû dest pê kiriye. Kurd radibin ser piyan, bi heyecan li xwe vedigerin, li hebûn, tarîx û kokên xwe hur dibin, bêtirs doza mafên xwe dikin, bi kurdûna xwe serbilind dibin. Hûn dizanin, di van rojan de, romana min a siyemîn "Siya Evîne" li Îstembolê, bi kurdî weşiya. Di civînek -du civîn û şevan de, xort û keçên Kurd dihatin ba min da ku ez romanê ji bo wan îmze bikim. Rûyê wan bi ken û

heyecan bû, ji çavên wan çirûsk difirîn. Ev, ruhekî nû ye; ruhekî jîr, xurt, xort, têgihîstî û modern. Tecrûbên tarîxî yê milletên din jî nîşanî me daye; eger milletekî xwe bi vî ruhiyetê gi-handibe, ew êdî zû bi zû wînda nabe. Heye ku riya bidestxistina doz û mafan pir dirêj be, lê ev ruhiyeta nû dê li ser vî riyê gelek problem û meseleyên me çareser bike. Welê dixuye ku civata kurdî bi her awayî diguhere, xwe nû dîke û ev ruhiyeta ku ez qalê dikim roj bi roj bêtir derdikeve pêş û dibe hakîm. Berê malbat, eşîr, navçe û heremên me, menfeatên wan li ser her tiştî bûn. Lê niha, di vî heyama nû de, hebûn û dozên neteweyî derketiye ser her tiştî.

Her mîna ku min li jorê jî got, em divê vî pêşketina pîroz bi berhem û eserên ilmî, felsefî, çandî hunerî û edebî dagirin û bixemilînin. Em divê li hev xwedî derkevin, hevûdu biparêzin, bi dijminatî li hev nenêrin û di pêwendiyên xwe yê bi hev re de pir demokrat û bêhnfireh bin. Em divê ji bîr nekin ku zerara me yekî, zerara me hemûyan e.

**Siya Evîne nuh derket. "Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê", "Mirina Kalekî Rind" û pirtûkên we yî din wê kengî derkevin? Hûn niha li ser çî dixebitin?**

— Belê, "Siya Evîne" nû derket. Ew gihîşt welêt û xwendevanên Kurd. Ma çî dikare kêfxweşiyê ji vî bêtir bide min? Mîna romanên xwe, ji welatê xwe bi 4000 kîlometere dûr, bi kurdî, nivîsin. Ji bo welat û milletekî xwe, ji bo xwendevanên Kurd. Min ew nivîsîne, lê xwediyê wan gel û welatê min e. Ew yadîgereke biçûk in ku min bi rêz û rêzdarî pêşkeşî ziman û edebiyata kurdî kiriye. Eger di rabûna vî pêla neteweyî û pîroz de alîkariyê min a biçûk jî hebe, ez ê xwe bextiyar his bikim. Ez dixwazim romanên min ên din jî bînin weşandin. Lê çawan û kengî, ez bi vî yekê nizanîm.

Ez niha li ser antolojiyê edebiyata kurdî dixebitim. Ji 3-4 salan û vir ve ye ku ez tevî bi qasî 20 hevalên nivîskar, zimanzan û pispor, li serê dixebitin. Ev xebata fireh li ber xelasbûnê ye. Ez bawer dikim ku eger ew biweşe û bigihê destê xwendevanên Kurd, kitabxana kurdî dê bibe xwediyê esereke nû ya bingehîn. Piştî vî xebatê jî, min dil heye ku ez dest bi nivîsina romana "Bîra Qederê" bikim. Ev roman dê li dora jiyana Celadet Alî Bedirxan bête hûrtandin. Ev bûn 7-8 sal ku ez li serê dixebitim û lê dikolim. Lê niha, êdî ez bawer dikim ku ez ê bikaribim dest bi gava nû bikim; nivîsina romanê...

Hevpeyvîn: A. Keskin



# Helbesteke Xanî

Xalid Yalçın

Mamosteyê mezin, Şêx Ehmedê Xanî di sed sala 17'an de hatiye dinyayê. Bi qinyata min Şêx Ehmedê Xanî şansek mezin e ji bo Kurdistan, ji ber ku Ehmedê Xanî mirovekî Kurd e û di nav Kurdistan de jiye, û afirandinên wî hemû bi kurdî ne.

Gelek ronakbîr û rewşenbirên Kurd ji bo Ehmedê Xanî dibêjin: "Ew Pêxemberê milliyeta Kurdistan e" Xanî şoreşgerek mezin e. Bê şik, ji bo yekîtiyê û xelasbûna gelê Kurd Ehmedê Xanî pir xebitiye û di wî warî de roleki mezin lîstiyê. Ne bi tenê ji bo neteweyê Kurd, belê ji bo neteweyên din jî xebatên girîng kirine. Lewra dibêjin ku Kralê Frensa Napolyon gotiye: "Eger we bivê ramanên we yê neteweyî bi hêz û xwîrt bibin, pêwîst e hûn pirtûka Ehmedê Xanî (Mem û Zîn) bixwinin."

Lê heyf û mixabin me rûmeta kesên weki Ehmedê Xanî ne zaniye. Her çiqas ji aliye gelê me de û ji aliye rewşenbirên me hatibit naskirin jî, dîsa me qedrê wî bi temamî ne zaniye. Pêwîst e em baş pê bizanin ku; heta em paşeroja xwe baş nizanibin em pêşeroja xwe pêşvenabin û pêşveçûn ji bo me, nabe. Weki Napolyon beri sedan salan qedrê Şêx Ehmedê Xanî zaniye, belê em vê gavê jî nizanin wî bi dirustî bixwinin, çima? Bo em neşên pirtûka xwe bixwinin? Divê em, ji bo halê xwe bigirin, heta ku em jî bi zimanê xwe, pirtukên xwe bixwinin.

Emê helbestek Ehmedê Xanî pêşkêşê xwendevanên xwe bikin, da ku ew bizanin Şêxê me çende zana bûye, ku



bi çar zimanan helbest vehûnane.

## Çargûşeyen xanî (2)

A- Fate emrî fî hewak ya hebîbî kuli hal

F- Ahû nalim hem demem şud der feraqet me

T- Ger berim kanim diler-sin çoktan olmuştur he

K- Dinu ebterbum ji eşqê min nema eqlu Ken

Ente fikrî fî fewadî ente rûhî fil cese

Leşkerî xem hayî tu milkî dilem wêrani

Bade geldim aşk ilinden isterim senden mey

Wan tetataran birne yexma e'qlû din û milkû

Tale xemmî zade hemmî şa'e sirrî fil me

Teşnef canu sulim çun şe-hide Kerbela

Yoksa sen divane oldun nî-

ce halim ey dilber

Ya ji nûve işweyek damin hebiba çav xezal

Bittî hicrana leste minni alimen

Herdem ez derdê Feraqet xafilî ez xalimin

Canî dildin arzî kıldım halimi canene ben

E'ruhala min tu xafil qet ne pursî e'ruzxe

Hel lena min nîmete weselel hebîbî min nesil

Uftadember deret bi çare sergirdan xesib

Derdimiz çokluk senden ona yok hiç tebib

Ey tebibî min dewayî derdê (Xanî) her û

(1) Kürtçe Türkçe Gramer (Celadet Bedirxan)

(2) Abdurraqib Yusuf Diwana Kurmancî

1971 Necef Bakısı

## Kî ne Em: Bêhna azadiyê

Hüseyin Deniz

Kî ne Em? Navê pirtûka nivîskar û hozanê mezin û bi nav û deng Cegerxwîn e. (Kî ne Em? We-

şanên Pelê Sor, 415 rûpel, Cotmeh 1991). Helbestvanê Kurdan Cegerxwîn (1903-1984) di saxiya xwe de gelek pirtûk nivîsîn. Di **Kî ne Em** de jîna Cegerxwîn û hunermendiya wî jî heye, qala pirtûkên wî jî kirine. Di pirtûkê de ev beş 16 rûpel e. Hozanê mezin Cegerxwîn 8 Diwan nivîsîne. Navê Diwanên wî wiha ne: Pîrisk û Pêti (1945), Sewra Azadî (1957), Kîme Ez (1973), Ronak (1980), Zend Avista (1981), Şefağ (1982), Hêvî (1983) û Aştî (1985).

Li gora 8 Diwanê Cegerxwîn, helbestên wî li ser van tiştan ne:

1- Helbestên li ser Kurd û Kurdistan û rewşa wan,

2- Helbestên li ser helbestvanên Kurdan,

3- Helbestên li ser gundiya, karkeran û hemû kesên belengaz,

4- Helbestên li ser dil, dildarî

û evîne,

5- Helbestên li ser egîti, mîrxasî, ceng û serhildanên Kurdan,

6- Helbestên li ser rewş û sinifên civatan,

7- Helbestên li ser aşî (lihevî), wekhevî û demokrasîyê,

8- Helbestên bi giranî li ser Marksîstî û Lenînîstî ye,

9- Helbestên li ser dîn û helbestên neteweparêziyê,

10- Helbestên azadî û serxwebûnê, ji bo azadî û serxwebûna mirovan, gelan û neteweyan,

11- Helbestên li ser pişgirtina navneteweyan.

Çend pirtukên Cegerxwîn ên çiroka û li ser zimanê kurdî û tarîxa Kurd û Kurdistanê jî hene.

**Kî ne Em**, pirtûkek helbestên bijartî ye. Di pirtûkê de ji 8 Diwanê Cegerxwîn helbestên ku hatine bijartin hene. Pirtûk bi

## AZADÎ

Abdurahman Durre

### Newroz

Newroz cejna Kurda ye, anku yekê biharê  
Ku ji Kawa da ew maye, bîst û yekê Adarê

Dijmin bivê yan nevê, gula kesk û sorû zer  
Iro nebe dê sibê, roja welat wê bê der

Here berf û zivistan, were bihar û Newroz  
Bijî sersala Kurdistan, cejna azadî pîroz.

Newroz, yanî roja nuh di 21 ê meha Adarê (bi awayê sala mîladî) dest pê dike û ew roj yekê meha Adara kurdî ye (bi awayê teqwîma kurdî). Sersala Kurdistan jî ew roj dest pê dike. Berya cûmhûriyetê li hemû Kurdistanê, hesabê sal û mehan wisa bû, hê jî di Kurdistan a Iran û Iraqê de wisa ne. Li gundên me jî hê ew hesab hene, mirovên kal û pîr hê jî wilo dizanin. Divê ku her Kurd, sersala Kurdistan û navên mehên bi kurdî rind bizanibe, hem jî divê ku, hemû Kurd bizanibin ku salnama (teqwîm) kurdî, bi damezrandina (teşkilîkirina) dewleta Med (Mad) dest pê dike, ku di sala '1700' î berya zayînê (mîladê) de, hîmê wê dewleta Kurd li bajarê Haqbetanê (Hemedanê) hatiye avêtin, paşê jî bûye împaratorî. Qralê wê yê ewil 'Keykubadê Kurd' bûye. Qralê wê yê mezin jî 'Kiyaksar' bûye ku dewleta Asûrî ji navberê rakiriyê. Qralê wê yê dawiyê jî navê wî 'Astiyaq (Astiyakes) bûye. Çawa ku sersala Ewrûpayîyan ji zayîna İsa pêxember, ya Êreban jî ji hîcretê (koçkirina Mihemed pêxember) dest pê dike, salnama Kurdistan jî ji çêkirina dewleta Med dest pê dike. Sersala wan jî ji yekê meha Adarê dest pê dike. Navê mehan jî bi kurdî wiha nin: Adar, Gulan, Cewzerdan, Pûşper, Xermanan, Kelavêj, Rêzber, Kellarêj, Serwawerz, Befranbar, Rêberdan, Reşemî (Reşeme). Salnameya Kurdistanê Iraqê jî wisa ye. Di Iranê de jî, di dema Şah de, hem salnameya kurdî hem ya farisî hebû. Mirov ku bixwaze salnameya kurdî hîn bibe, li ser sala zayînê '700' salan zêde dike dibe sala kurdî. Mîsal: İsal sala zayînê (mîladê) 1992 ye ku '700' lê zêde bibe dibe 2692, ku di 21 Adarê de sersala Kurdistan dest pê dike û dibe '1-Adar-2692' niha hê jî em di sala '2691' di meha Reşemê de ne.

Divê ku em ev sersal û salnama xwe bizanin, çawa ku Kurdê Iran û Iraqê dizanin û bikartînin.

Gava ku em zaro bûn, me yekê Adara kurdî sersal dizanibû, ew roj pîroz dikir, herwekî ku niha jî Newroz tê pîroz kirin. Belê sersal herwekî sersala Ewrûpayîyan di yekê meha Ocaxê de ye, lê divê ku em qetnebe bizanibin sersala me yekê Adara kurdî ye.

Çiroka Newrozê jî di dîroka gelê Kurd de wiha cih girtiye: Dibêjin ku piştî Cemşîd padîşahê gelê Arî (Kurd-Faris û yê din) dimire, 'Biyorasf-Zehhak' li textê wî rûdinê. Cemşîd çiqas adil bûye, ew qeşmer jî hewqas zalim û xwînwar bûye. Ji gelê Arî jî nebûye (dibêjin ku Samî bûye). Li ser milê wî, du ûr mîna du maran derdikevin, ku her roj serê du xortan jê dike û mêjiyê wan di-de wan herdu marên ku li ser milên wî derketibûn. Kurdekî bi navê Kawayê hesinker hebûye, çend lawên wî hebûne. Zehhak hemûya dide şerjêkirin, dor tê serê lawê wî yê dawîn. Kawayê hesinker, pêşmalê bersingê xwe yê hesinkeriyê radike û weke ala azadiyê bilind dike û hemû kesên ku ji ber zilma Zehhak revîne û xwe veşartine, ketine çiya û dehlan li xwe dicivîne (dibêjin ku agir li serê çiyayên bilind vexistine û pê xeber dane hev, ji ber wiye ku di her cejna Newrozê de agir tê pexistin) êrîş didin Zehhakê zalim dikujin. Ferîdûnê kurdî tînin ser text û ev roj dibe sersal û cejna azadî. Zilm, zor û zivistan diçe, azadî û bihar dest pê dike.

kurdî û bi tirkî ye. Berhevker A. Balî helbestên Cegerxwîn zivîrandine zimanê tirkî û pirtûk bi herdu zimanan, çapkiriye. Xwendevan karin kurdî û tirkî bînin hemberî hev û bi hesanî ji helbestan fam bikin. Di **Kî ne Em** de 56 helbestên bijarte hene.

Ne hewce ye ku em rexnê li helbestên mamosta Cegerxwîn bikin. Ji xwe ne heddê me ye jî. Helbestên hozanê mezin Cegerxwîn bi Kurdiyêk pir paqij û hesan hatine nivîsandin. Wek ava kaniya zelal û biroqankî ne.

Biçûk mezin, xort, pîr, kal, jin û mêr hemû kes bi rihetî û bi hejêkirinek ji dil karin helbestên Cegerxwîn bixwinin. Ez bawer nakim ku tu Kurd hebin ji helbestên mamosta Cegerxwîn dilxweş nebin. Lewra di helbestên Cegerxwîn de Kurd hene, welatê Kurdistan heye, rewşa xelkê heye, dîrok û tarîxa Kurdistan heye. Ji helbestên hunermendê mezin Cegerxwîn bêhna azadiyê tê. Bêhna serxwebûn û serhildanê tê. Bi kurdî em karin bejin di helbestên Cegerxwîn de her Kurd kare xwe bibîne.



Kî ne Em?

pelê sor





### Zarok kulîlkên welêt in

- Geli nivîsarên Kurdan çawa hûn ji bo mezinan dinivîsîn ji bo biçûkan jî binivîsîn. Ji bîra nekin: Zarok kulîlkên welêt in. Zarok hatinên me ne. Zarok sibehên bi xêr û bêr in
- Mirov çawa biharan hez ji kulîlkên çol û çiyar dike wisa jî hez ji zarokan dike. Dinya çawa bi kulîlkan dixemile, xweşik dibe, welat tevde, mal, gund û bajar jî bi zarokan xweşik in

**W**ek li cem hemû gelan pîroz e (xelka) li ba gelê me jî zarok pîroz in. Zarok xemla mala ne, kulîlkên welêt in. Mezinên îro jî wextekê zarok bûn. Dê û bav bi zarokan bi hev dişidin. Yanê zarok jî dê û bavan re, ji malan re wek zemqê ne. Xebata mezinan tevde ji bo zarokan e ji bo jîneke baş, bextewar, û serfiraz e. Xebata giştî jî ji bo ku zarok di welatekî azad û serbixwe de bijîn.

Mirov çawa biharê hez ji kulîlkên çol û çiya dike wisa jî hez ji zarokan dike. Dinya çawa bi kulîlkan dixemile, xweşik dibe, welat tevde, mal, gund û bajar jî bazarokan xweşik in. Cihê zarok lê tunebe, ji çire ye?

Neteweyê Kurd, gelê me pir rûmet û qedir di-de zarokan. Gelek gotinên pêşyan li ser zarokan hene. Bav û kalên me, bapîrên me berî bi hezar salan wilo gotine: "Kes naxwaze kes jê çêtir be, herkes dixwaze lawê wî jê çêtir be." Zarokên me îro di nav xebat û berxwedanê de li pêşya dê û baven xwe ne. Em ji ber zarokên xwe fedî nakin. Serê me bilind e. Keç û law tevde di nav berxwedanê de cihê xwe standine.

"Zikê zarokan tije ye lê zimanê wan nagere." Zikê mezinan jî tije ye lê nahêlin bipeyivin. Pîkol û xebat tevde ji bo ku mirov bêtirs û serbest bipeyive ye.

Geli nivîsarên Kurdan çawa hûn ji bo mezinan dinivîsîn ji bo biçûkan jî binivîsîn. Ji bîra nekin: Zarok kulîlkên welêt in. Zarok hatinên me ne. Zarok sibehên bi xêr û bêr in. Her bijîn kulîlkên welêt.


Hüseyin Deniz

# Çîroka pîrê û rovî

Hebû gundek! Gund di nav dar û bera û şînkayê de winda dibû. Li wî gundê xweş pîrek feqîr hebû. Du biznên pîrê hebûn. Pîrê xwe bi şîr û mastê wan bi xwedî dikir. Şevkê ji şevê biharê, pîrê biznên xwe dotin û şîrê wan kir bin mekebê. Pîrê serê sibehê rabû û çû kû şîrê xwe ji bin mekebê derxe. Mekeb hilgavt û li bin nerî ku şîr tune ye, xwedê bide. Tiştêkî şîrê biznan vexwaribû. Pîra feqîr nema zanibû bê wê çî bike. Gelekî li ber şîrê xwe ket, lê tiştik ji destê wê ne dihat. Roja din dîsa biznên xwe



dotin û şîrê wan kir bin mekebê. Wê şevê pîrê xwe li ber mekebê veşart ku dizê xwe nasbike. Derengê nivê şevê pîrê wa nerî ku rovîk ji wir ve tê û zimanê xwe li dora devê xwe dixê. Hat ber mekebê li dora xwe nerî, kes li wan deran tunebû. Mekeb hilgavt û kir ku têkeve bin, hema pîrê rahişt şonik û avêt rovî. Şonik li terîka rovî ket û terîka wî di nêvîri jêbû. Rovî jî êşa terîka xwe re bazda, çû çolê nav hevalên xwe. Gava ku hevalê wî, ew bi nivîrê dîtî. Giş pêkeniyan û jê pirsîn? Roviye rind çî bi terîka te hat? Rovî bi dilekî şikestî ji wan re got. Hevalno lê nepirsîn. Tiştê hatiye serê min,



bela neyê serê şeytên. Paşî ku hat ser hişê xwe, li terya xwe nerî û gelekî li ber xwe ket. Rabû ser xwe da ser rîya gund. Rast çû ber deriyê pîrê.

- Ban pîrê kir û wiha ji pîrê re got!

- Pîrê pîrê ka terîka mi?

Pîrê-şîrê min ji min re bîn, ezê terîka te bidim te.

-Rovî çû cem bizinê..

-Bizinê bizinê ka şîrinî bide min, ezê şîr bidim pîrê, we pîrê terîka min bide min.

-Bizinê ji rovî re got...

-Her ji min re çilo bîn, ezê bixwim. Wê şîrê min pîrê wî çaxî ezê şîr bidim te.

- Rovî çû cem dara çilo...

-Darê Darê ka çilo bide min, ezê bidim biznê, wê bizin şîr bide min, ezê bidim pîrê, we pîrê terîka min bide min.



-Darê got ez tî me, her avê ji min re bîn, bera ber min bid, wê çaxê ezê çilo bidim te.


- Rovî çû ser kaniyê.  
- kaniyê kaniyê ka avê bid min. ezê bidim darê, wê dar, çilo bide min, ezê bidim biznê, wê bizin şîr bide min, ezê bidim pîrê, wê pîrê terîka min bide min.

- Kaniyê got...

- Her bang keçekê gund. Bela bîn li ser min govendê bigrin. ezê kêfxweş bibim û wê ava me xurtbibê wê çaxê ezê avê bidim te.

- Rovî çû cem keçikên gund...

- Keçikno keçikno, werin li ser kaniyê govendê bigrin, wê kanî avê bide mi, ezê avê bidim darê, wê dar çilo bide min, ezê çilo bi-



dim biznê, wê bizin şîr bide min, ezê şîr bidim pîrê, wê pîrê terîka min bide min. Keçikan ji rovî re gotin.

- Her ji me re, her yekê re cotek sol bikir. Wê çaxê emê bîn govendê bigrin.

- Rovî rabû çû bajêr, ji qizikan re sol kirin. Vegeriya hat solên qizikan dan wan. Qizik çûn ser kaniyê govend girtin, kaniyê av da rovî, rovî çilo da biznê, bizinê şîr da rovî, rovî şîr bir da pîrê. Pîrê terîka rovî jêre xemiland û da rovî... Rovî terîka xwenî xemilandî bi xwe vekir û hat nav hevalên xwe. Kêfa wî û hevalên wî gelekî bi terîka wîre hat.

Memo



## Agirê Newrozê...

### Destpêk rûpel 1

kete şer. Niha jî gelê me, li dijî Dehaqên nuh di bin pêşengiya Kawayên xwe yê hemdem û leheng ji bo serxwebûn û azadiyê di nav şer de ye.

Newroz, piştî 80 yan bi taybetî jî bi hilpişkîna 15 ê Tebaxê gelê me bêtir ber bi azadiyê ve dibe. Niha meşhela Newrozê, ji duh zehftir riya û azadiyê ronahî dike.

Newroz, niha bûye xof û tirsêke mezin ketiye nav dilê dewletê. Mebesta dewletê ew e ku Newrozê ji naveroka wê dûr bixe. Anku bê naverok bihêle. Lê em dizanin ku Newroz, bi naveroka xwe ve, berxwedan, serhildan û serkevtin e. Dewleta Tirk, berê, Newrozê qedexe dikir. Lê niha qedexekirina Newrozê ji hêza dewletê der e. Vêca dewleta Tirk, divê ku Newroz, li gor qîma wî bê pîroz kirin. Rêveberiya taybetî, çarçova pîrozkirina Newrozê datîne û ji bo ku çavê gelê me bitirsîne wiha dibêje: "Newrozê di salonan de pîroz bikin, dixwazin werin di oda min de pîroz bikin, eger hûn wiha pîroz nekin, an jî li derve wek xwe pîroz bikin, em ê we bikujin."

Pîrozkirina Newrozê mafê gelê Kurd e. Çawa bixwaze wê

wisa pîroz bike. Tu mafê dewleta Tirk tune ku çavê gelê me bitirsîne û bibe asteng ji bo pîrozkirina Newrozê.

Eniya Rizgariya Netewa Kurdistan-ERNK, di belavoka xwe ya ku ji bo Newrozê belav kir de, wiha dibêje: "Newroz, yekîti, serhildan û azadî ye. Dewleta Tirk, li hemberê me şerekî mezin û giran vedike û divê ku welatê me ji nuh ve dagîr bike. Nexo em jî, ji bo welatê xwe bersîv bidin. Derebeyên dikanên xwe dadin, quntaxên ereban bigirin, riyana tev bigirin. Bila diruşmeyên (siloganên) me bigihêjin ezman. Li her aliyê welatê me bila sembola serxwebûn û Newrozê, agirê rengîn pê bikeve û bilind bibe."

Elbet gelê Kurd, wê Newrozê li gor qîma xwe pîroz bike. Pêwîst e ku gelê me di vî Newrozê de yekîtiya xwe xwiritir, serhildanên xwe firehtir û azadiya xwe nêzîktir bike.

Serokê PKK ê Abdullah Öcalan dibêje ku: "Bi Newroza 92 an re divê ku gelê me ji bo parlamentoyeke neteweyî, ji bo damezirandina Hikûmeta Cengê, xwe amade bike. Emê gelek tiştan bidewîsinin Newroza 92 an. Em bi vebir (qetî) dibêjin wê pêk binin. Em ji xwe û ji gelê xwe bawer in."

### Destpêk rûpel 1

Mazlum Doğan di Newroza sala 1982 an de roja şehîdbûna xwe bû Mazlum Doğan'ê îro û Newroz jî ji vî salê û vir de bi şehîbbûna Kawayê hemdem Mazlum Doğan bû Newroza rakirin û serhildanan.

Belê, ne mimkûn e mirov qala Newrozê bike û pêre jî Mazlum Doğan bi bîr neyne.

Navê Newrozê û yê Mazlum Doğan bûne yek, behsa jiyana Mazlum û berxwedana Mazlum bê ku mirov behsa Newrozê bike û behsa Newrozê jî bê ku mirov Mazlum bi bîr bîne wê nîvrê û netemam be.

Çawa Newroz û Mazlum ban hev dikin û bi hev re dixwiyin, herwiha Mazlum û berxwedan jî bîyê hev nabin û yek yê din tîne bîrê.

Mazlum Doğan berî bi 10 salan, şeva Newrozê li zîndana bajarê Diyarbêkrê piştî berxwedaneke efsaneyî û jiyaneke serbilind û bi rûmet şehîd ket. Şehîdbûna Mazlum Doğan bû agirê xebatê û ji bo me bû ronahî.

Mazlum Doğan berxwe-

## 'Berxwedan jiyan e'

dan e û "berxwedan jî jiyan e"

Di van rojên ku em li Newroza sala 1992 an diqedimin de em silav û hurmetên xwe ji giş şehîdên riya azadî û serx-

webûnê û bi taybetî ji Mazlum Doğan û Zekiya Alkan re pêşkêş dikin û bi hêviya baştirîn Newroza heta niha, Newroza we gişan pîroz dikin.

## Piraniya meclisê zordarî xwest

### Destpêk rûpel 1

hev 10.000 milîtanên PKK hene. Hin karin bipirsin bê ma ka we çî kir, ka tedbîrên we standin.... Berî ez bêm vir min çend caran bi Konseya Ewlekariya Neteweyî MGK re çend civîn kirin, em bi hev şewirîn û me çareke baştir pêde nekir. Em ne razî ne belê em çî bikin."

Di meclisê de çend caran nexweşî derket û mebûsên partiya Türkes MÇP û yê ANAP ê li hev xistin û meclîsa Demirel û İnönü rojek gelekî bi xirûcir li pey xwe hişt.

Bila bi bîr bê ku Meclîsa Enqera ne 380 kes bi tenê ye. Hejmara Mebûsên Meclîsê 450 kes e. 70 kes di wextê minaqeşekirin û dengdanê de ne hazir bûn. Bülent Ecevit û giş hevalên xwe nehatibûn Meclîsê. Grûbê Deniz Bay-

kal, İsmail Cem ku endamên serokayetiya SHP ê ne ew jî ne li Meclîsê bûn. Erbakan serokê Partiya Refahê û Mesut Yilmaz yê ANAP ê piştî Demirel dest bi axaftina xwe kir bi demekê hatin.

Dengdayîna roja sêşemê Rêveberiya Taybetî çar mehên din dirêjkir, belê çî dirêjkirin û çî hal. Ev sererû û şiklî mîna serketina Demirel û İnönü bixwiye jî, di esasê xwe de destpêka kirfzeke siyasî ye. Ev kirfza giş partiyên Tirkîyê yê meclîsê ye.

Siyasîyên Tirkîyê yê nas û dehsalan, xet û rêbazên burjûwazî û tiradisyonel ketine dawîya emrê xwe, li dawîya zemên û rastiya îro mane û bi giş nekirkêriya xwe li meydana ne.

Di demeke nêzîk û ne dûr de wê pêla bayê siyaseteke demokrat, hemdem û şoreşger li Tirkîyê li ba keve û siyasiyên bi şeref, xwedî berpîrsiyarî û xwediyên gotin û sozên xwe derkevin arena û meydana siyasî.

Parlamentoya Enqera roj bi roj bê prestîj û bê itîbar dibe û di dengdana 17 ê mehê de hinekî din jî ev bê itîbarbûyîn mestir bû.

## Gundan bombe..

### Destpêk rûpel 1

Li ser bombebaranên û operasyonên hefteya dawî komûtanekî gerila ev tiştên jêrîn ji nûçegihanê kovara Berxwedanê re gotine: "Li cihê hate bombebarankirin qempeke me ya seyar hebû. Teyarên Tirk di nav 10 û 13 ê mehê de bi sedan bombe avêtin. Komara Tirk bi rojan got ku "me ew îmhî kirin", "Ji destên me xelas nabin" belê eslê wê tune. Li jor êrîşên asmanî û li jêr jî bi hezaran eskerên wan tiştê nekirin. Agirê topan li şkeftê girêdan, heta nîvro êrîşê berdewam kir. Piştî nîvro kuçikên xwe berdan şikeftê ji termê hirçekê pêve tiştê nedîtin.

Roja bombebaranê bi şev artêşa me çembera ku li dora me hatibû çêkirin qelaşt û xwe gihande herêmeke ewletir. Di vî demê de çar pênc hevalên me şehîd ketin. Laşên şehîdan me bi xwe re birin."

Gava herêm dihate bombebarankirin hêzên dewletê nehiştin ku rojnamevan têkevin herêma bombekirî. Nûçegi-

hanê Berxwedanê dibêje "incex me roja 15 ê mehê karfûbû xwe bighîne cihê bûyerê. Li vî herêmê li dora 20 şervanên ARGK hebûne, li nav xelkê geriyane û li ser rewşa dawî û siyaseta dewletê xelk agadarkirine."

Li vir Berxwedan xwe dighîne gerila û van agehdariyên li jor me nivîsîn didin Berxwedanê.

Li aliyê din Berxwedan didomîne "12 Adarê li Dêrsimê, qeza Mêzger ê (Mazgirt) li gundê Riçikê (Geçitveren) di nav grûbekî ARGK û ordiya dewletê de şer derdikeve, di vî şerî de ji hêzên dewletê pir kes hatin kuştin. Her wiha di netîca bombebaranên asmanî de 6 gerilayên ARGK jî hatine şehîd kirin."

Bombebaranên û êrîşên erd û esmanî li nav bajarê Dêrsimê acizî û nexweşiyek mezin çêkiriye û xwendevanên lîsê mekteb boykot kirine."

Li gora nûçegihanê Berxwedanê wê ji xelkê sivîl pirr kes hatibin kuştin.

## Qontr-gerîlla

### Destpêk rûpel 1

Piştî ku şev dikeve erdê, mirov tukesî li sûka Nîsêbinê nabîne edî. Hemû kes bi xof û şik li hev dinerin û kes newêre ji mala xwe derkeve.

Bi kurtî, tîmên taybetî Nîsêbinê kirine weke berûdê.

Li Cizîrê Panzerên tîmên taybetî mizgeftê xerakirin.

Timên taybetî edî bi êrîş-

kirina ser malên welatparêzan tîr nabin, dest bi kirinên xerabî dikin: êrîş dibin ser zarokên piçûk û wan dikujin, digirin ser mizgeftan û xeradikin. Bi kurtî tîmên taybetî hizûr ji gel re nehiştine.

17 ê Adarê, li Cizîrê, tîmên taybetî bi panzeran êrîşî ser gel kirin û zarokêkî 12 salî (Mehmet) û zilamekî 23 salî hatin qetî kirin, 6 kes jî birîndar bûn. Lê bi vî jî dilê wan rihet nebû girtin ser mizgeftê.

## ROJEVA WELÊT

### Em Newrozê ...

#### Destpêk rûpel 1

Şerê nav heqî û neheqiyê, piştî Kawayê hesinker û Dehakê zalim jî nesekîni û îro jî ev şer germ û gurr e.

Dehak jî û Kawa jî tim hene. Ev herdû celebên mirovan li herderî û li her welatî peyde dibin. Dehak û Kawayên her welatî hene.

Esat Oktay Dehakek bû, General Abdullah Alpdoğan Dehakek bû û Qontr-gerîla jî Dehakên zemanê me ne. Kesên ku îro xwîna me bi neheqî dirjînin, me digrin û dikujin, me di binê zîndanên de dirizînin û jiyan li me û zarokên me kirine dojehe giş nevi û bizrên Dehak in.

Zarok û neviyên Kawa jî hene. Mazlum Doğan û zekiya Alkan ji bavikê Kawa ne.

Kawayên me pîr bûne, bûne bi hezaran û li her aliyê welat rabûne ser xwe.

Roja 13 ê vî mehê Wezîrê kulturê Fikri Sağlar ji bo rojname-nivîsaran civînek çêkir. Di civîne de ragihand ku dê Newroz li her aliyê welatê bête pîrozkirin.

Li gora ku em dibihîzin û ji rojnameyên rojane dixwînin ji bo giş waliyê welatê re name hatine rêkirin pîrozkirin û pîroznekirina Newrozê xistine destên wan.

Li aliyekî sisêyan gotinek heye ku eger Newroz di salonên girtî de bête pîrozkirin dê hêzên dewletê midaxale nekin û bila xelk Newroza xwe pîroz bike.

Li aliyê çaran jî xelkê Kurd bi hemû dilxwaziya xwe divê Newroza xwe ne le gora reçetên filan û bêvan, belê li gora adetên xwe, rewş û pergala xwe pîroz bike.

Newroz di salonan de nayê pîrozkirin, çawa darên gwîzan, çinaran, spîndar û çaman di guldankan de nayên danîn, cejna Newrozê jî rasterast girêdayê xwezayê, guhertina tebiatê û hatina biharê ye, di salonan de hîlnaye.

Newroz berî her tiştî cejna gelê Kurd e, ev cejin dikare bibe cejna gelê Tirk û giş gelên din jî yê ku em û ew bi hev re dijîn. Ji bo vî jî awe û şeweyê pîrozkirinê, rengdayîn û rêvebirina vî cejnê bila ji bo gelê Kurd bête hiştin. Gelê Kurd çawa dixwaze bila Newroza xwe bi wî şiklî pîroz bike. Ya demokratîk û rast ev e.

## Maskêya dewletê ket

Yuzbaşiyê Farqînê Bülent Eroğlu zarokên Kurdan bi kotekî dikê sîxur. Bülent Eroğlu, demeke dirêj e ku tîkilî bi xortên Kurd re yê ku di nav gel de tîne hez kirin, datîne. Bi fêl û fendan û bi şantajên divê ku wan bixapîne û li hemberî gelê Kurd bikar bîne.

Yuzbaşî Bülent Eroğlu, çend rojan berê ban Rîfat Akış dike, ji bo ku Mehmet Menge bikuje 20 milyon pere, keleşînkofek û bombeke destan didê. Rîfat Akış diçe cem mirovê ku bikuje, lê ji kirinên xwe poşman dibe û serpêhatiya xwe ji Mehmet Menge re vedike. Ew her du jî radi-bin gazî Mebûsê Şimexê Orhan Doğan dikin û vî pîrsê jê re şrove dikin. Orhan Doğan jî vî gemariya şerê taybetî ji raya ge-lemperî re diyar dike.

Rêveberiya taybetî, li hemberî tîkoşîna gelê Kurd neçar maye û hêviya xwe bi van fêl û fendan ve girêdaye.



# Newroz: Roja xwenuhkirinê

Mehmet Aktaş / ZPS

Newroz, helbesta agirê ye, ya ku 2603 sal berê ji Asuran dest pêdike û îro jî li Botan berdewam e. Newroz, sembola roja ku em ji devên berpirsiyarên xirabiyê rizgar bûnc. Zanayê Miemmerê ku her sal

Ev rengê ha go ji bo me ehval  
Go: Adetê pêşiyê zemanan  
Ev bû li hemî cî-yû mekanan  
Wextê we kû şahsiwarê xawer  
Tehwîl-î dikir mahê Azer  
Yanî ku dihate bircê sersal  
Qet kes ne dima mesken û mal  
Bilcîmle dicivîne der ji malan  
Hetta digîhîşte pîr û kalan  
Roja ku dibûya îd û Newroz  
Tazîzê ji bo dema dilefroz

Dema ku çivîkên koçerî ve-digerine hêlîna xwe, dema ku bihar, zivistana reş diqewire, berf hêstirên çavên xwe berdide axê, roj berhemên çavê xwe diavisîne û kulîlkên Newrozê di welatê me de dişikve.

Ev kulîlk, sembola evîne, hêvî û berxwedanê ye, daxwaziya têr ya bazdanê ye, dema keşkirina evîna nuh ya serkeftina tiştên rind û candar yên li hemberî zordariya reşî ya zivistanê ye. Wek ku helbestvanê mezin Cegerxwîn dibêje: "Newroz, roja me ya rizgarbûnê ya ji devê berpirsiyarên xirabiyê ye." Ji ber vê yekê her sal di 21 ê Adarê de ev kulîlk ji nuh ve dişikve. Ji lewre li Botan, dîlan dibin serhildan û serhildan dibin dîlan.

Newroz: Roja zayîna Kurdan ya ji diya xwe Newroz, li hemberî kedxwariyê, destana berxwedanê û li hemberî xirabiyê, destana evîne ye. Di navbêra şerê xirap û qencan de, serketina bindestan e. Newroz, roja baweriya Kurdan bi hêviyê ye. Roja me hemûyan a zayîne ye.

Helbestvanê Kurd Qedircan, di dema Newrozê de şahiya me ya jiyane û evîna me ya azadiyê qise dike:

"Newroz sersala me ye  
Adet û ola me ye  
Biçûk û mezin ê me,  
Dibêjin êdî dem e,  
Diçine sersala hev,  
Keyf û govendê dikin  
Ji bo ku serxwe bibin,  
Dijmin ji ber xwe bibin,  
Sersala Kurdan pîroz  
Ev e cejna me, Newroz"

Belê di dema Newrozê de,

● Newroz: Roja zayîna Kurdan ya ji diya xwe Newroz, li hemberî kedxwariyê, destana berxwedanê û li hemberî xirabiyê, destana evîne ye. Di navbêra şerê xirap û qencan de, serketina bindestan e. Newroz, roja baweriya Kurdan bi hêviyê ye. Roja me hemûyan a zayîne ye

● Belê tê bîra me serhildana Şêx Seîd, Koçgirî û serhildanên Botan yên 89-90 î. Gelê me, pirtirîn, di ve hîvê de, bi xwesteka yekbûn û jiyana bi hev re tijî bû. Em vê jî dizanîn. Ji ber vê yekê piraniya rêxistinên neteweyî, me di vê hîvê de bicih anîn. Ji bo vê jî neyarên me re bû hîveke bitirs



daxwaza me ya jiyane diguhere berxwedanan. Em xwesteka xwe ya ji bo afirandina dinya û weletekî nuh hembêz dikin. Mirina me, dibe şirovekirina jiyaneke nuh.

Agirê ku Kawayê hêsînker,

li burcên seraya Nînova pêxist, li Amedê di agirê ku Mazlûm Doğan di bedena xwe de pêxist, pêt dide. Çaran û bûka Newrozê ya ciwan Zekiye Alkan, bi bedenên xwe li agirê azadiyê pif dikin.

Generalê mezin yê Medî ku bi arteşa xwe ya 60 hezarî, dagîrkerên Asûr ji holê rakir, îro jî li hemberî dagîrkerên wek Asur, li Botan serhildanên ku bi 10 hezaran tevî dibin tê pêkanîn. Newroz, bi

serhildanan wateya (mana) xwe heye.

Newroz, cejna bindestan tev e.

Cejna Newrozê, bi gelê Kurd re gelê Fars, Belucî, Talas, Afgan jî pîroz dikin. Gelên ku bi evîna serxwebûnê dişewitin tev Newrozê pîroz dikin. Îro li hemû derê dinyayê, roja natişkîkirina nijadperestiyê ye. Îro, roja mahkûmbûna şovenîzmê ye. Agirên Newrozê û serhildanên me îro li rojhilata navîn ji bo gelên herêmê hêviya rizgariyê ye. Li dijî teslîmkarî stûewardin û bêçaretiyê berxwedan e.

Ji bo ku Newroz, berxwedan û serketina Kawa nin, Dehaqan jî, di vê mehê de jehriya xwe diverêşînin. Dehaqê hemdemî Sadam 4 sal berê li Helepçeyê qetliam çêkir, tê bîra me sed hezaran Kurd, hîna 1 sal berê hîva Newrozê, li welatê xwe koçber û di pençê birçibûn û mirinê de derbas kirin. Tê bîra me ku Şêx Seîd, Qadî Mihemed û bi hezaran şervanên welatê me yên bê nav di meha Newrozê de ji hêla dagîrkeran ve hatin kuştin.

Belê tê bîra me serhildana Şêx Seîd, Koçgirî û serhildanên Botan yên 89-90 î. Gelê me, pirtirîn, di ve hîvê de, bi xwesteka yekbûn û jiyana bi hev re tijî bû. Em vê jî dizanîn. Ji ber vê yekê piraniya rêxistinên neteweyî, me di vê hîvê de bicih anîn. Ji bo vê jî neyarên me re bû hîveke bitirs.

Her Newroz, ji bo me Mîladeke nuh e. Ew dizanin ku her 21 ê Adarê dîrokeke nuh e, şehîd û lehengên (qehreman) nuh derdikevin holê.

Gelê me, wê bi dîroka xwe û mirovahiyê ve, rûpelên bi wate (mana) bizeliqîne. Dîsa wê xweliya Nînovayê bibe jêdera jiyana me. Berjînen ku bi hezar salan nekariyan hişk bikin, wê li her alî derkevin. Dîlan û govendên ku li her aliyê welatê me bê gerandin, bi şewata hesreta dinyayeke nuh hemû insan tevî bibin. Ew dizanin ku her Newroz ji bo wê, bibe jiyaneke nuh.

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyare Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres): Başmusaşip Sok. Talas Han 16 Kat: 3 No: 301 • Tel-Fax: 512 12 87 • Cağaloğlu / İstanbul
- Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ

welat